hejimar '15'
Tîrmeh 2013

Hevbenda Nivîskar û Rojnamevanên Kurd li Sûrî

PÊNÛSA NÛ

شهرية تصدر عن رابطة الكتاب والصحفيين الكورد في سوريا


Sernivîser
Qado Şêrîn

Derhener
Xorşîd Şûzî

# Peyvên Şêrko Bêkes berî 20 salan

## Hevpeyvîna kovara Zanîn

(Xeleka yekê)



Şêrko Bêkes
(1940-2013)

Bi helkefta dawî, ku helbestvanê mezin Şêrko Bêkes koça xweyî dawî kir, em dixwazin ji xwendevanên rojnameya (Pênûsa Nû) re hevpeyvîna ku ligel nemir Bêkes di sala 1993 ji alî helbestvan Ibrahîm Yûsif hatibû kirin, û nivîskar Ebdulbaqî Huseynî wegerandibû zimanê kurdî, û di kovara Zanîn de hatibû belavkirin, li vir careke din dubarebikin, çimkî peyvên nemir Bêkes di her heyamê de bejin bilind û dewlemend dimînin, û hilma welat û çanda kurdî ji wan dibarin ….

Hevpîvîn bi pêşgotinekê bedew hatibû xemlandin, û paş re pirs hatibûn kirin, wekû di hejmara heftan ji Kovara Zanînê hatibû belavkirin, wiha emê ji we re li ser du xelakan, belavbikin.

### Pêşgotin:

Di xarîta helbesta kurdî de navê Şêrko Bêkes bi tundî weku yek ji giringtirîn navên dahênanî diyar dibe, û giranbuhaya wî ne ji ber ku di Kurdistana basûr de şalyarê çandeyê ye, lê ji ber ku bejna helbestvan a dahênanî pir bilinde, û ew digel van navên helbestî ên nûjen: Qedrî Can, Goran, Rojen Bernas, Ebdula Peşêw, Refîq Sabir;… Evên ku dîrokek hêja di jiyana helbesta kurdî de pêkanîne,…

Şêrko Bêkes hişt ku guhdariyek nû çêbibe, zimanê wî ê toreyî û karîna wî a rastî hişt ku canek nû di cendekê helbestê de vejine,.. Ev tev di berhemên wî de belû bûne,..

Û wegerandina wî ji naveroka beyana (Riwange) a nûjenî, ewa ku heşt û dilhzkirinek mezin ji bo paşeroja helbesta kurdî bi gelemberî nû za bide.

Şêrko Bêkes kurê Suleymaniyêye, ew çavdêrê bobelata gelê xwe bû, ew gelê ku di dîroka mirovatiyê de jiyanek pir perîşanî derbaskir, ne tenê bi zarokên Helebçe re a ku faşistê yekem bi awayên ne mirovane ew qelandin, digiriya, lê bi birînên hemî gelan re digiriya!.

Û ev rewşa han di berhemên hemî dahênanên kurd di Kurdistanê tevî de belûye.. Dema ku çêla kul û derd û birînên gelên din dikin, wekû çêla ên xwe dikin.

Şêrko Bêkes helbestvanekî netenê li Kurdistanê hêjaye û bikêr tê , lê belê bikêrî cîhanê jî tê…, û qezenckirina wî ji xelata (Tocoliskî) re, van gotinên jorî bi cî dike.

Û em dibînin du dahênanên kurd ên cîhanî Şêrko Bêkes û Selîm Berekat hêjane ku xelata (Nobil) bighê wan.

Çiqasî em li ser Şêrko Bêkes bibêjin hindike, û ev pêşgotina kurt mafê wî pêknayne, ji ber vî hawî, emê gotinê jê re bihêlin ku bersivên pirsên me bide..

### Hevpeyvîn bi zimanê erebî: Ibrahîm Yûsif

### Wergerandina kurdî: Ebdulbaqî Huseynî

## Hevpeyvîn

1. **Zaroktî, xwendinên pêşî, kelepor, bîranên yekem digel helbestê ve.. û çima helbest? Xwezka tu li ser van hemiyan biaxive..**

Şêrko Bêkes: Hûn li ser çi dixwazin ez biaxivim, li ser zaroktiya xwe a ku ji alî rengê reş ve hatibû kuştin, dema ku bavê min mir, û pişt re jînek perîşanî di himbêza dêkê, ku herdem bi reşiyê pêçayîbû, û ew hîn ciwan bû, belê ez ji bexçê rengan ji bilî du rengan nayê bîra min: Reş a ku min çêla wê kir, rengê kirasê diya min, û rengê berfa ku di zivistanê de li welatê min Kurdistan dibare!.

Tunebûn, zikmakiya helbestî li cem min şiyarkir,.. wê çaxê min xwe li pêşiya ziman nedikarî xwe biparêzim.. û cara yekem ji çîrokên gelêrî û dastanan, ez fêrî xweşiya ken bûm, wekû hemî zarokên normal ku xewnên şevan dibînin..

Min hez ji xuristê kir, ew kopên cadûyî, û çiyayên herî bilind, û baxên ku bi dengekî bilind di şevê de dipeyivin.. ew babelîska digelewrên çirisandî diçe.. tu tişt ji xuristê mezintir nîne.. û agirê di odeyekê biçûk de vêketî, diya min, xuşk û birayên min û çîroka; hebû, nebû, mîrek li devereke dûr hebû… û li darên ku bi şikeftan re diaxive ez guhdarbûm.. û ewr bi ezman re û baran li derve dibariya,.. û diya min ta dawiya şevê çîroka xwe berdewam dikir.. ta ku ez di xew diçûm, û di xewna xwe de ez bi laş di rêkên çiyayî de dimeşiyam, derdiketim ser darên berûwan, dikeniyam, digel keroşkên kovî dileystim, bi ava sûlavan ên zêvî xwe dişoştim.. û min dilezand ta ku bighêm Xezalê, û dibin siya şengebîyekê de devê wê maçdikir..qefdek ji xecxecokan jê re pêşkêş dikim..û bi vî hawî, dema ku ez şiyardibim ez di cîhana helbestî a cuda xwedîdibûm..

Mirov nikare xwe ji cadûwekê sev û roj li bal wîye, zû zû xwe rizgar bike,.. zimanê helbestê nêzîktirîn zimane ji alî vejîna xuristê ve,.. ew bixwe zimanê heyvê ye, û zimanê perîşanaye jî.

Firehiya ziman, firehiya zimanê helbestî a ku zû xwendevan têde naghê, ku tiştin dî pêre tunebe, wêne di hundirê wênê de, min bixwe û di civana yekem de hez vî zimanîkir.. zimanê razên xwe bi hesanî diyar nake, wek evîna ku di civata yekê de xwe naspêre evîdarê xwe.., ew bixwe hezkirina zehmete, û digel wilo jî zehmetî carna xweşe,.. ew bixwe êşe.., eger dûrî te ket, dê tu bêriya wê bikî, bi hêviya ku li te vegere, û te bişewitîne.., wekû yek bi kulîlkan bê şewtandin.

Di destpêkê de dema ku min ristên xwe dihûnandin, tenê tiştên di bala min de bê huneriyek cak min dinivîsand. Nivîsandinên min di hundirê min de diman, dernediketin ji derve,.. nivîsandinin bi ava gulabûn, lê diserî tenê de bû, danediket ser pelikan,.. herdem ez xemgînbûm, min digot; gelo tiştek heye wê bê, û hayê min jê nîne,.. û min nedizanî wê kengî bê,.. ez li benda zimanekîbû, min ew ziman di peywendiyên xwe de nedidît.., ew ne zimanê bazar û dibistanê bû, lê zimanê destan û efsanên ku diya min ji min re digotin, lê bi rengekî nû, bi kirasekî nû, û bi rageşanek nazenîn, tenê ew ziman, min di xewna xwe de didît.., min çiqasî hezdikir ku ez wekû baran erdê himbêz dike.., û çiqas min hezdikir ku ez wek dengê bahozê di şevên zivistanê de biaxivim.

www.arsivakurdi.org



1. **Ji kelepora feqetiyê a kilasîk di cîhana helbestê de, ta danîna hîma yekem bo birojeya nivîsandina helbestek kurdî nûjen.., xwezka tu ji me re diyar bike, bê eve çawa çêbû?**

Şêrko Bêkes: Dahênana helbestî cîhaneke wê tenê heye, digel ku awayên wê pirin, em bixwe li cewher digerin, dema ku em helbestekê dirêsin, ta ku li himberî demê raweste.. ji berî 300 salî çend firokên helbestî ên herî nazik di ezmanê kelepora me de difiriyan, û hîn jî bi çelengî difirin.. tu dibêje niho dest bi firandinê kirine, dahênan dahênane, tiştê ku di koka xwe de hêjabê, dahênanvan berî hemî tiştî di hundirê ziman de dikelin (şoreşê xwe vêdixin),.. şoreşa feqehan, şoreşa riyalîzman, şoreşa suryaliyan.

Di herdemê de helbestvan û pêximberên wê hene,( Nalî ) di demê xwe de dengekî nûjen bû, di hundirê ziman de dijî, zimanê pûteyî hilpiriya, helbestvanê dahênan herdem tiştan dugherîne.

Divê dahênvan zanibe, ku berdewamkirina ziman û pêşxistina wê jê tê xwestin, ji ber ku ziman cemeke û ji bo ku herdem ev cem biherike, divê dana dahênanan berdewam be!.

Goran, serê pira helbesta nûjen bû, wî guherînek ji alî têgihiştina helbestî li bal milet ve çêkir, bi zimanekî hêsan û şêrîn, wek şêrînbûna Kurdistan dinivîsand.., û wekû tê nasîn ku saz wek baranê ye ji canê helbestê re … wilo jî saza hundirê helbestê guhert.

Piştî Goran gelek awayên helbestî lingin me peydabûn, lê eve piştî şerê cîhanê ê yekem hatin û di riya Turkiya de a ku wê çaxê pêşve çûbû,.. û Turkiya bibû wek dilekî di navbera Rojhilata û Rojava de ji ber vê zûzû tevgerên konevanî û civakî û toreyî têde gesbûn, wekû em dizanin wê çaxê hinek ji torevanên kurd li Turkiyê bûn, û evan bûyerên ku me çêla wan kir şûnekariya xwe li wan kesan kirin, li vir ez karim navê Pîremêr û şêx Nûrî şêx Salih û hinin din diyarbikim, ji ber ku evbûn kesên yekem ku bi gelemberî nûbûnanîn toreya kurdî, û bi taybetî li helbestê… û eve halê tev çandeyên ku dighên hev,… ta ku cokine dahênanî diafirînin.

2. **Helbesta kurdî di berhemên Şêrko Bêkes û Ebdula Peşêw û hinin din.., karîbûn kulên demê û bûyerên giring bi zimanê demê pêkbînin…, Gelo tiştekî dî li bal te heye ku tu li vê gotinê zêde bike?**

Şêrko Bêkes: birastî, xarîta helbestî a nûjen niho li nig me di Kurdistana başûr de guheriye, an jî van salên dawî hatiye guhertin.., erê dahênanên Ebdula Peşêw û Refiq Sabir û Letîf Helmet û hinin din, cirîskin pir ronî û zêdeyiyên giring anîne holê, lê niho dengin xweşik tên diyar kirin, ew nenasbûn, ev bixwe jînenîgerya jînê ye, ku herdem tiştin nû pêktîne.

Destpêkên me di salên heftêyan de bû, dema ku me karekî mezin, berbicav kir, ku me beyana Riwange a toreyî, ango berî 22 salan, helbet me cav li beyana helbestî 69 di Iraqê de ketin û cav li tevgerên nûjenî di cîhana erebî de, û beyana 68 di Misrê de.., dêmek em karin bêjin ku Riwange bû banga nûjenî an jî bû sêrwana nû ji bo lebtandina gola qeşagirtî, hin dahênanên xwe rawestandin û hin sistbûn û hinan berdewamkir.

Ez li dervî welatbûm, di biyaniyê de min dinivîsand, ..û berhema dawî ku min nivîsand destanek helbestî bû, bi navê (Derbenda pinpinîkan) ku sala 1991 derket, qalindbûna wê 235 rûpelin ji qetên orte, û ta niho ez berdewamiya nivîsandinê dikim, û piştî vegera min li welat, min ewrin sipî ji helbestan dîtin, û di nav nifşê nû de, ji xortan min dengên sûlavên helbestî bihîst, yek ji wan xortan (Bextiyar Elî) e, ew bixwe dengek bilbilîye, jîre, ristên wî bilindin, niho gelekî pêşdikeve.., digel hin dengên din mîna (Qubadî Celî Zade, Kerîm Destî, Nûzad Rifet) û helbestvana jêhatî (Kejal Ehmed), ev steyrika geş di ezmanê helbesta kurdî a nûjen de.


**(Berdewame…)**

## Şêrko Bêkes di çend rêzan de (Nasnameya wî)

- Şêrko Bêkes ji zayînê Suleymaniyê ye (1940). Bavê wî helbestvanê kurd ê nemir BÊKES e.
- Dest bi nivîsandina helbestan kir, hîn temenê wî 16 salî bû.
- Di sla 1963an de, di şoreşa êlûnê de (li Kurdistana başûr) bû şoreşvan û di pêlweşa (Radiyo) ya şoreşê de karkir.
- Dîwana wî a yekem di sala 1968an de çapbû.
- Piştî peymana Avdara 1970 digel çar helbestvanên kurd mîna: Hejar, Dr. Merûf Xiznedar û Ezedîn Mustefa Resûl, bû endamek di komîta yekîtîya nivîskarên kurd li Bexdê.
- Piştî şikestina şoreşa 1975 digel tibabek ji niştimanên kurd, rêcîma Bexda dûrkirin başûrî Iraqê.
- Di sala 1980î de, digel çend hevalên xwe û li herêmên rizgarkirî, yekîtiya nivîskarên kurd bi rengekî nehênî sazkirin.
- Ji dervî welat, çend xelatên toreyî qezenckir.
- Li Swêd jiyan dibû ta serhildana 1991 vegeriya welat.
- Di sala 1993an de li Kurdistana başûr bû şalyarê çandeyê.

## Ji Berhemên wî:

- Ronaka helbestan (helbest-1968)
- Hewdeca girî (helbest- 1969)
- Kawayê hesinkar (sanoyeke helbestî- 1971)
- Ez bi rivînê têhnşikestî dibim (helbest- 1973)
- Xezalê (şanoyeke helbestî- 1978)
- Hingûr (şanoyeke helbestî- 1978)
- Du stranên çiyayî (helbest 1980)
- Cem (Çîrokne helbestî-1985)
- Neynikin biçûk (helbestin hilbijartî- 1988)
- Derbenda pinpinîkan (destanek helbestî- 1991).




www.arsivakurdi.org

## Daxuyaniya Navenda PEN a Kurd



Îro dîsa careke din, tevgera rewşenbîriya Kurdî bi xemek giran re roj ava kir. Mixabin kesayetiya rewşenbîr, nivîskar, rojnamevan, welatparêz, pêşmerge û siyasetmedarê Kurd , Felekedin Kakeyî, îro li me malavayî kir.

Malavayîkirina kesayetiya navdar ê Kurd Felekedîn Kakeyî wê valebûneke mezin di xebata wêje, ziman, azadîya raderbirînê û yeksanî û pirrengiyê re bihêle.

Nivîskar Felekedîn Sabir Kakeyî (1943), ji sala 1964'an re dest bi nivisînê kir û di sala 1967'an de yekem romana xwe çap kiriye û heta roja dawiyê jî di qada wêjekarî û rewşenbiriyê de jiyaneke têr û tijî jiyaye.

Bi koçkirina rêzdar Felekedin Kakeyî, Navenda PENa Kurd, peyama sersaxiyê ji malbata wî re û dost û hevalên wî û tevahiya gelê Kurd re dixwaze.

Xebat, nav, berhem, hest û helwêstên Kakeyî wê herdem mînakek ciyê şanaziyê be di nava Me Kurdan de.

Bila sere gelê Kurd saxbe .



## Felakedîn Kakeyî 1943 - 2013

Felakedîn Kakekî li sala 1943an li bajarê Kerkûkê ji dayîk bûye. Yek ji endamên binemala seyîd û şêxên Kakeyiyan e. Despêkê ligel çalakvanên siyasî yên erebên Iraqê wek kesekî kurd ê çep dest bi nivîsîn û karê siyasî kir. Piştre di rojnameya El-Taxî ya Partiya Demokarta Kurdistanê (PDK) de ji girtîgehê quncikek bi navê 'Heceliyet' bi nehênî (Celal) nivîsî. Li ser jiyana karker û pirsgirêka kurd nivîsand. Di dema şoreşa îlonê de tevlî karûbarên ragihandinê bû.

Piştî têkçûna şoreşê, penaberî rojhilatê Kurdistanê dibe. Di despêkirina şoreş û serkirdayetiya demkî ya PDKê de rolekî berçav hebû. Heta kongreya 12mîn, endamê komîteya navendî û polîtburoya PDKê bû. Kesekî nêzî Idrîs Barzanî, Mesûd Barzanî û Nêçîrvan Barzanî bû. Di hemû çalakiyên rewşenbîrî û rêxistinên rewşenbîrî de wekî pêşmergeyekê rolekî berçar di sazkirin û dirûstkirina wê de hebû.

Piştî raperînê bû yekemîn endamê parlamentoya Kurdistanê. Herî dawî jî postê wezîrê rewşenbîrî yê Herêma Kurdistanê wergirtibû.

Felakedîn Kakeyî piştî hilweşîna rejîma Seddam, li Bexdayê bû edîtorê rojnameya El-Taxî. Wê demê yek ji rojnameyên herî zêde li Iraqê dihat belavkirin bû.

Kakeyî di nava navendên rojnamevanî, rewşenbîrî û siyasî yên Kurdistan û Iraqê de kesekî navdar bû. Gelek giringî dida babetên çandî û perwerdeyî. Gelek tişt li ser tesawefiyê dizanî û evîndarê lêkolîna tesewif, edebyat û çanda kurdî bû.

Di kêliyên herî giran ên şerê navxweyî de, dinivîsand ku wê ev şer raweste û kurd neçarin destê xwe bixin di nav destên hev de. Ger îro amadekarî ji bo kongreya netewî tê kirin, gelek keyfxweş bû ew kar ligel Idrîs Barzanî pir hewl da bû, mijûle tê cih.

Felakedîn Kakeyî kesekî nêzî Tora Medyayî ya Rûdawê bû û bi berdewamî fikir dida Rûdawê. Rêze peywediyekî di navbera Rûdaw û rewşenbîrên parçeyên din ên Kurdistanê de bû. Gelek bi Rûdawê keyfxweş bû. Lê mixabin mirinê rê neda ku zêdetir alîkariya Rûdawê bike.

Bîranînên Felakedîn Kakeyî wê timî di bîra rêveber û hevkarên Rûdawê de wekî bîranîn bimînin. Bi navê Tora Medyayî ya Rûdawê serxweşiyê li xizm, kesûkar û dostên wî dikin. Gora wî tejî nûr be. (Rûdaw).



www.arsivakurdi.org

*Bêkes Têlo*



# SÛRGÛN.....EVÎN....MIRIN

( III )

## * 8 rojên Dilber ê

Jiber jiyan seyr e,her qewimîn têde kare rûbide,loma bawer nakim kes matmayî ji evînek kûjer bimîne. Carna di jiyanê de ,hin kes tu ha ji wan nabe û guhdan nadî wan, roleke mezin dilîzin û bo te dibin kesên pir giring.Mehmed (Firhad Taniş) di film 8 rojên Dilberê de ,ê seqet wisa rolek giring di jiyana Dilberê (Nisrîn Çewadzade)de dilîze ta hişt ew evîndarê xwe bikûje.

Filmê 8 rojên Dilber ê(2008) ,tevlî ne zelalbûna navê film bo temaşe van re, lê bi min pir balkêşe ku bi rengekî sîmyolojî ,bi wateya weke sînyaleke zimanzaniyarî , afran dineke bedew hatiye destnîşan kirin.Film Xwedî peyameke mirovahî ye,tijî ramanên rexne kirin bo civat û desthilata ramyarî a Tirkiyê ye.Li ber lehengê ku keçeke gundî ye,azwera (tamûh) wê,xewna wê ew e ku bi evîndarê xwe re ê ji zarokitiyê ve bizewice ,film wê li ber du hilbijartin dihêle.An xeyanet bi zilamê xwe re (Mehemed) bike û an jî ,evîna xwe a yekem bikûje.

Film ronahî dipijqîne ser pêwendiyên kevneşop û şûndemayî ji belengaziya qêrîn hewar li kurdistana bakûr, tîne ber me.Welê jî , weke çiraka birûskekê, derhinêr Cemal Şan di film de ,mirovê dîn ku ji girtiyên bîrûbawerî ye di encama eskencan de dîn bûye,bi wêneyekê kurt tîne ziman.

Bejdarbûna ew mirovê dîn bi hevokek tenê gava dibêje: „ li rastiyê bigerin,ger we wê ne dît,ewê we bibîne,,cavkaniya mijara film tevî ye . Film xaleke pir girîng ji azarkêşî ji rewşa jinê li Kurdistanê nîşanî me dike. Ne serbixwebûna wê ji mêr û hejariya rewşa wê a civakî, remyarî, aborî û aloziya lihember bûna wan kevne şopiyan, ligel pêwendiyên ne mirovan e bi wê re.

## *Dîmena yekem

Ji destpêka film bêhna tirajîdiyê difure, dîmenek hestedar temaşevan dagirdike. Perdak reş,keçek bi tewana xwe mukir dibe û tenê dengê wê tê me, dibêje :Erê min wî kûşt , min jêre got nêzîkî min nebe lê ew nêzîkî min dibû!.Min gulek berda lingên wî lê nesekinî ,paşê zik û dûvra dilê wî .

## *Dîmena duwem

Çîroka film ji kêlîka ku Dilber bi lêz ji mal derdikeve û bi bez diçe yarê xwe li ber çemekî bibîne ta kêlîka kûştina evîdarê xwe, ji 20 ta 28 Nîsanê berdewam dike .Li ber qeraxa robarekî Alî (Osman Akça) evîndarê wê jêre radigihîne ku nikare bibe hevjînê wê.Çimkî bavê wî soz dabû hevalekî xwe ku keça vî hevalî bo Alî ye gava hîn zarok bûn.Û sibe şahiya wan û ew bi xwe nikare li hember biryara bavê xwe rabe an dijber be.Li vira şermezariya dîtwer û temaşevan diyar dibe.Gelo bi çi mafî bav çarenûsa zarokên xwe ewan biryaran didin?. Hînga pêlek ji hêrsbûn Dilberê dizîgzîgîne , das di destê wê de diçe mala bavê Alî ,li wira li pêşiya gundiyan bavê Alî disa jêre dibêje ku wî û dostekî bi Quranê sûnd xwarine ku keça wî Xecê ji Alî re ye,û nikarin ji soza xwe vegerin.Çimkî welê xwedîbûne û ev ji kevneşopiyên ku li ser rabûne.Dilber hêrs dibe û bi girî ji hemiyan re dibêje : ev sitmkariye ,helwestek ne mirovane ye…qede bi we û bi kevneşopiya we bikeve. Ta neçar dibe bi qêrînek sûnd bixwe û bibêje ku mêr ê yekem ku we bixwaze ewê bizewicîne û ta wê demê ewê di koxka mirîşk û biznan de bije.

## *Dîmena sêyem

Mehmedê seqet xwedî kopal ,çawa vê sûnd û peymana Dilberê dibîhîse ,dide rê di nav deşt û newalan dku xwe bighîne gundê wê û ji xwe re bixwaze.Dilber 8 rojan bi Mehmedê karmend re dije paş ku bû jina wî,Dilber li ba Mehemed jiyanek nû dît weke nûderîn be jêre ji hezkirinê,tilvîzyon,êlektrîk,ji mala rêkûpêk, paqijî.Mehmedê dilpak hemû xwestekên dilber pêk tîne.

Ta xwestika wê ku dest nedêye di şeva yekem de, ta bi ser xwe ve bê.Mehmedê ku bi hemû wetaeyan mêr e,ta bi seqtbûna xwe ve hewlda berde Alî ji xaniyê xwe gava di roja 8 an de ,hat ji Dilberê xwest lê vegere. Bi çav girî ji jiyana keder ku têde dije,giyanê wî dihat givaştin ji poşmaniya biryara bav.Ji Dilber dixwaze lê veger ,paş pevçûnê di nabera Alî û Mehmed de,demance ji Alî dikeve,Diler neçar dibe rahêje û ji yarê xwe ê yekem bixwaze ji mala wan derê.Lê Alî her û her nêzîk dibû ,hinge Dilber sê guliyan berdide nig ,zik û dilê Alî.

## *Dîmena carem

Rûyê Dilber ê rengavetî li kamîrê di dawiya film de weke di destpêkê de temaşe dike. Weke ku me tevan (civaka kurdî ) gunehbar û sûcdar bike ji rûdana ku pêre çêbûye.Bi taybetî gava pirsek dîtir ji wê tê kirin ,ger tiştek dîtir li ba wê heye ku bibêje.Li vira derhinêr bi rengekî serkeftî dihêlê ku Dilber bê deng be,li kamîrê tameş bike ,weke ku ji temaşvan re bibêje eve çîroka min, bi hêvî me hûn dadwerekî rasteqîne bin.Di rola lehengê de ,bêdengî ciheke giring dilîze weke şêweyek vebêjiyê ku gazî wejdanê temaşevan bike.Ligel serkeftina derhinêr ku zimanek bi wêne û mûzîka nalîngaz bikar anîye ,bi karanîna cilûberg û zikakên kevir ji rewşa jiyana gundiyan ,wênyeke şînî dide nîşan kirin.Dîmenên dirêj û liva kamîra a neblez ku xwedî destîşanên bi wate ne, ligel mûzîk ku film jîndewar dike. Dengên ji xwezahiyê çi ji dengê robar an çûkan û dengê ba bejdar dibin.Derhinêr bi hostetî dihêlê em trajîdiya jineke kurd bijîn li gel hêza wê yî a hundrirîn a xûrt. Cihê gotinê ye û pêdiviyê destnîşan bikim rola Dilber (Nisrîn Çewadzade) dilîze ku Azarî ye,pir serkeftî û bi şanazî rola xwe lîst ye,welê jî Mehmed pir bi şanazî rola xwe lîstî ye. Pêwîstiya me bi weke van filman heye,ku têkeve kûrahiya civaka me û hemû ne erîniyên wê derxe serû bi başî û xerabî.Lê Cepkên herî bilind bo Derhinêr e ( Cemal Şan ) ku karîbû bi zimanê Sînêma dûr ji vebêjiya zêde,bi wêne û mûzîk ,tirjîdiya jina kurd bîne ziman.

## *Jiyan mafe ne erk e….

Filmê Îspanî *MAR ADENTRO* bi kurdî "Derya di hundirê min de" mijara ku dibe evîn kûjer be radixîne , ku mirin biser jiyanê ve nakeve.Peyamek bedew radigihînê,ku dimirim deku bijîm .Mijara film çirokek rasteqîne ser jiyana helbestvanê Îspanî yê binavûdeng Ramon Sambîdro ku tenê dîwanek helbest bi navê "Nameyên ji Ejdehê nivîsandiye û navê film helbesteke ji vê pirtukê ye.Bi vê dîwanê kete dîroka helbestkariya Îspanya de.Helbestvanê ku birayara xwekûjî da,paş 28 sal ji pûçbûnê.Rûdana ku pêre qewimî,carekê xwe ji tahetekî bilind davêje deryayê deku sobanî bike.Serê wî li qadê dikeve û stûwê wî tê şikenandin ,di encamê de pûç dibe. Film sala 2004 hatiye der,xelata Oskar û hin xelatên dîtir ,giha 57 xelat wergirtiye.

Lehengê film ku bi rola helbestvan dilîze,Xafyêr Bardem e, lîstikvanê herî nêzîk ber dilê min e,ligel lîstikvanên mîna (Richard Gere )Rîçşard Kêr,Mayîkil Doglas,Lêonardo Dîkabiryo,Dîan Lane,Sofya Marsû û Jûlya Roberts .X.Bardem pir filmên hêja lîstiye weke „Evîn di dema Kolêra de,, ji Romana nivîskarê Kolompî ê navdar Gabrîl Markîz,filmê - „Vîkî,krîstîna Berşalona „ , „ xweşik„ , û „Bixwe,limej bike û evîdar be„ lê di vî filmî de pir serkeftî bû. Film ser destê derhênerê zîrek Alejandro Amenbar destanek bedew pêşkêşî me dike.Pirsek li pêşiya me radixe,dibe tu bimirî deku bijî ?.Destê xwe datîne ser wateya hebûnê di jiyanê de.

Ramana film ew e ku mirov biryara jiyan an mirin bi destê xwe ve bide.Ku mirinê hilbijêre ji devla jînê,lehengê film gilî li dadgehê dike bi riya parêzê xwe Xûlya ku daxwaziya wî a xwekûjî qebûl bike ,lê dadgeh xwestika wî red dike .Ramon bi salan e fêrbû ku kedera xwe bi lêv ken veşêre,û qerfê xwe bi çarenûsa xwe bike.Malbata wî curbicur birayara Ramon şîrove dikin.Klîse bi ti hawî birayara wî nepejirîne,Roza a ku dibe hevala wî paşê jê hez dike û pêre dizewice.Ramon jê dixwaze alîkariya wî bike deku bemire gava jêre dibêje „ kî hez wî bike ,gereke alîkariya wî bike deku bemire„.Ramon hîn bûbû ku bi ve rewş re danûstendinê bike bi riya xewnê bi deryayê re,weke destnîşanak ku di hundirê me de derya heye.Talî Roza daxwaziya wî dipejirîne ,jehir dixe peyalek av û dide Ramon û welê giyanê wî rehet dibe paş çapkirina pirtuka wî. Film ji destpêkê ta dawî,ligel mûzîkek ku giyan ji hundirê bi kûrahî dilerizîne.Film xêrxwaze ,hûrbîne ,hestedare ,dihêlê tu bi mereziya leheng re hest bibî.Lehengê ku dihêle hemû kesên li derdorê bi wateya jiyanê biramin û Jiyana me weke deryaya Ramon e tijî pêl,poxên veşartî û wateya jiyanê dide me ku jiyan mafe ne erkeke.Kî film temaşe bike ,bi bêdudilî dibêjim ewê bibe kesekî dîtir û ticar ev film jibîr nake. Sûrgûn,Evîn û mirin kwînêreke di jiyana me de, hevrê ye bi me re,êşa di cavê wan de weke komirekî dadayî ye.

www.arsivakurdi.org

*BÊWAR BARÎ TEYFÛRÎ*

# Rizgarî cesaret û yekbûne



Cesaret nirxekê menewî a mirovahîyêye . Jîyana bê cesaret li bin tirsêda derbaz dibe bê wate û bê hêjaye. Tirs hemû derfetan ên mirovan dide xitimandinê .

Dûjminê lapî mezin tirse, tirs nexaşîke îrsîye (dol) xronîke . Cîyê ku lê cesaret heye tirs têk dice . Miletê kurd demeke pir dirêjbû ketibû li bin bandorên tirsê. Tirsê gellekî hukmî li ser kurdan kirbû, ev tirs dujmin bi sed salanva ji vî gelîra anîbû.

Hertim jî birayên kurd ên cuda cuda bi ser nave biratîya olî bi zimanê oldarî bi derewan kurd dixapandin (û gellek cara hemberî hevdu kurd radikirin) bi navê ol bi navê Xwedê kurd didane tirsandinê, bi sîyaseteke qirêj paşê jî kurd înkar dikirin. Ji ber vê tirsê kurd hevdura xwedî dernediketin.

TIRS KUJERÊ ZÊHNÎYATÊ Û MENEWÎYYETÊYE

Jîyana bi tirs mirina bê wedeye. Cesaret hewildan û wetaya jîyanêye .

Jîyanêda cesaret û zanebûn vejîne . Tirs jî elameta xizantîyê, mirin û tune kirinêye . Ne ku tenê kurd usa jî welatê wan û bi navê kurdayetîyêva girêday hemû tişt: ziman, dîrok, çand, zargotin, huner û y.d. hatibû tirsandin û dagirkirin. Demeke pir dirêjbû kurda nikarbû ji tirsa nirxên giranbaha yê netewî ra xwedîtî bikirana .

Jîyan cesaretê hesdike, cesaret jî azadîyê . Gel qedera xwe dispêre ewledên xwe ên têgêhiştîye bi cesaret. Menevîyata gelan jî di zanebûn û merîfeta kesayyetên yên gelêrîva tê pîvandin . Gel beqî ewledên xwe ên bi culet, bi cesaret û zane dibe milet.

Kesayetên gel jî ku tên tirsandin an jî dagirkirin wê demê gel ji pêşerojê tê qutkirin û ber bi tunebûnê ve tê meşandin. Lema jî kesayetan ra berî her tiştî cesaret, culet pêwîste .

Mirovên bi cesaret û têgêhiştî dergên azadîyê li ber gel vedikin, dergevanê azadîyê û jîyana netewin .

Her tişt qîmetê wê heye , lê pejirandina nûjenbûnê pir dijware.

Mirovahî hertim ji nûjenbûnê newêre.

Rizgarbûna Kurdistana Azad serbest û azadbûna kes û keseyata kurdên cîhanêye, azadbûna menewîyata gelê kurde, tewsandina tirs û xofêye a ku li ser netewa kurd bi sed salan va ji hêla zebtkar û qetilkarên kurdan va dihate pêk anîn. Kurd û kurdayetî di sînorê tirsêda hatibû givişandin, fetisandin û înkar kirin, resena keseyata kurd dihat talankirin, heyîn û hebûna kurd dihat tune kirin.

Gelê ku li bin bandoran da dijî qîmetê xwe winda dike û ji hemû nirxên netewî û menewî, ji mirovahîyê dûr dikeve.

Gelê rizgar altindar û alvane, rizgarî tu tiştîra guhurandin nabe, gelê azad nemir û jîre .

Belê rizgarbûna Kurdistana Azad azadîya menewîyata netewa kurda , bilindaya serê kesên kurde, serkeftina cesareta kurde, sîyanet, şeref û wetaya jîyana gelê kurde. Rizgarbûn parastina şeref û nirxên gelê kurde . Rizgarbûna gelê kurd destanîna cesaret û zanebûna kesayetên gelêrîye.

Rizgarbûna Kurdistana Azad şansa xwe îfade kirina keseyata gelê kurde, him li welat da, him jî ji welat der cesaretê dike ruhê kesayeta kurd.

Li ber vê cesaretê tirsa sed salan (hezar salan) têk dice, kurd û Kurdistan bi kubarî û bi bawerî careke din xwe digihînin şaristanîke miqîm ber bi pêşerojê gavên hemdemî davêjin.

Şoreş û cîvata bê kesayet, bê rewşenbîr hertim dikule an jî têk diçe. Welat ku undabûnê millet jî winda dibe , mirovê ku welat nasnake bi xwe jî nasnake. Ji bo vejîna gel û destanînên nû hertim kesayetên rewşenbîr ên têgêhiştîye bi cesaret pêwîstin. Kesayetên bi cesaret azadîyê bê hedd û bê şert hesdikin.

Beşa mirovahîyê a desthilatdar her dem ji nûjenbûnê xwe pajda dide . Şoreşa Berzanîyê bê evez niştîmanêda bû hewla destpêka nûjenbûnê. Gelê kurd ji stûxarîyê a li ber dîrokê û ji tirsê xilas kir, gel gîhande sîyaneteke tewrebilind (alî).

Ji bo azadîya keseyata kurd, ji bo rizgarîya welat netew dijî dagirker û qetilkaran ên xwîmêj, ên qenîmê kurd û kurdayetîyê, dijî tirsê seferber kir. Kurdistana Azad berhem û xelata cesaret û şoreşa Berzanîyê têgêhiştî û lêgêndar (efsanewî) û nemire. Rizgarbûna Kurdistana Azad derfetê dide kesên kurd ku li resena xwe ra xwedî derkevin.

Armanc û daxwaza kurdan azadî û wek hevîye . Tu astengîyan ev meramên qenc nikarbûn bidin qerisandin û fetisandin, azadîxwezîyê hertim jîyanêra derfet dida gelê kurd.

Netewa kurd li ser parastina nirxên mirovahîyê biryar girtîye bi vî awayî jîye û jîyaneke bi şeref îro didomîne, bi cesaret dijî û diafrîne, hêjayî jîyanêye.

Hemû dijwarî û zordarî bi şeref alt kirin bûne alvanê serkeftinê li Kurdistana Azadda. Gel li ser şarîstanîke klasîk, li ser çandeke kevn modêrbûneke pêşketî bi bawerî dîyar û ava dike, di Rojhilatêda bûye nemûne (mînak).

Hukumdarîya bi zorê ya li ser gelan hertim mirovahîyêra zirarê tine . Bê bawerbûn tunebûna menewîyata mirovahîyêye. Gelê kurd bi cesaret, bi bawerî pêjda dimeşe.

Tirs pêşketinanra astengîyan çêdike, lê bawerî derfeta pêşketinaye .

Kurd jîyana paqij gellekî hesdikin, bûne xwedî culet û bawerîke miqîm, nirxên mirovahîyêye tewrebilind (dêmokratîyê) dipejirînin û dinirxînin, efrandar û parazvanên azadîya pîrozin li rojhilatêda, binelî, bajarvan, û torîvanê dîroka kevnarin, bûne şehedê dîrokê li her demê .

Bi cesareta xwe va îro dîrokê duguherin, serarast dikin. Bajarvan û binelîyên dunya kevnar cîhana hemdemîda bê şik hêjayî jîyana paqij a wekhev û nûne.

Him cesaret, him jî feresata wan têra vê yekê dike.

Kurdistana Azad li cîhana bê dad, bê edaletda altindarîya netewa kurde a li ser zulm, sîtem û koletîyê , altindarîya li ser tirsê, zelaletê û dagirkarîya barbare, jîyanek zelal û bi cesarete ji bo hemû kurdan.

Her gel gorî hêza xwe dijî û dimeşe .

Kurd bi cesaret di nav dunyake bê dad û bê edalet rewşa jîyanê û hukmê dîrokê a durû û hov duguherin cîhanek wek hev ava dikin û bi serfirazî ber bi hetevîyê diçin.

Gelê ku an jî kesê ku li bin bandoranda dijî nirxê xwe (qîmet) unda dike û ji hemû nirxên menewî ên gelêrî, netewî dûr dikeve. Mirov û netewên bê welat ên bindest sêwîyê cîhanê, hêsîrê dîrokêne.

Miletê bê welat barekî girane ji bo dîroka mirovahîyê, hertim ber bi tunebûnê tê defdanê, kişandinê, zêdeyê jîyanêne. Ên ku ji bo çareserîya pêşeroja wan bi zanetî dikevin li bin vî barî kesayetên bi cesaretin an navê mêrxasîyê distînin an jî şeîd dikevin (qehremanin).

Aferîn ji wanra. Miletê ku ji bo pêşerojê şeîda dide ji mirinê natirse û venakişe serbilinde û mafê wî jîyanê heye.

Şeîd wesîla jîyanêne a bi sîyanet . Netewa kurd ji bo pêşerojê, ji bo jîyana serbest, paqij bi mîlyonan va şeîd qurban dane.

Di sedsalîya dawînda qurna XX an da pênc mîlyon ewledê xwe hêja undakiriye gelê kurd. Dîroka mirovahîyêda tu miletî ewqas şeîd nedaye ji bo rizgarî û pêşerojê. Bi şeîdên xweva gelê kurd û her çar parçê Kurdistanê serbilind û şahnaze. Şeîdên niştimanê mizgînya pêşerojêne a serbixwe.

Welat nanê cesaretê û azadîyêye, gelê bê cesaret, bê culet bê rumet û serberjêre.

Welat qedera mirovan û şerefa gelane .

Rizgarî cesarete, cesaret jî hêz û azadîye, yekbûne…

Welatê kurdan Kurdistan li bin vîna dewletên desthilatdar yên împerîalîstda dihat hincirandin, çewsandin û talan kirin, çawa ku li girtîgeha dunyayêda mabû,dihate zêrandin.Şikir îro kurd û Kurdistan berbi azadîyê,berbi serxwebûnê dimeşin.Kurdistana Azad şansa rizgarbûna Kurdistana giştîye.

Ev parçeke Kurdistanê di meydana azadîyêda gavên xwe ên pîroz bi kubarî , bi bawerî û bi serfîrazî pêşda davêje,duxulxule,xweş û şên dibe .Kurdên bi şeref hemû bê firnax û şanazin,îftîxarê dikin,xwe bextewer û hetev dihesbînin .

Ji vê hêjatir jîyanêda tu tişt tunene.Kurd behra cesareta xwe divînin,welatê xwe ra xwedî derdikevin.

Mirovên ku hevdu fehm nakin, naecbînin,hevdura qedir danaynin nikarin yekbûna xwe ava bikin.Yekbûna gel ê kurd derengî ketîbe jî xuya bû. Kurd azadîyê tu tiştîra naguharin.Pêşeroj ya kurdane.lewra kurd yek dibin…

16-17.x1.2005

www.arsivakurdi.org

*Dr. Ehmed Xelîl*



# Hêmanên bidest xistina erdnîgariyê

## Bayê Dîrokê:

*Gaston Botol* di gotineke xwe de dibêje:

„*A giring ewe ku tu bizanibî ba ji kuva tê, da ku tu xwe navêjî dijî wî*"[1]

Erê, pêwiste em kurd jî bizanibin bayê dîrokê ji kuve tê, û bi kuve dere, da ku em xwe navêjin dijî wî, û em her dem ji bûyeran bi poşmamî û destvalayî bidernekevin. Bi rastî, bavpîrên me, di çarçewa danûstandina tevle dîrokê de, gelekî li paş bûn, pirê caran, bi serhişkî, li dijî rêveçûn dîrokê diçûn, guh nedidan şert û mercan, lewre jî her dem pir êş û kêm sûd bûn, lewre jî ta îro em bindest û welatparçe mane.

Di rêveçûna dîrokê de tewşankî nîne, nexêr, her bûyerek berhema hin sedem û hêmanane, lewre divê em dîroka cîhanê bi hûrikî di bin çavan re derbaskin, ji ber ku pêşeroj, niharoj û paşerojê ji hev ne cuda ne, çand, konevanî, aborî û erdnîgarî jî ji hev ne cuda ne.

Bi gelemperî, çar rasteqîn destên xwe bi hevre datînin ser rêveçûn dîrokê û çêkirina çarenûsa gelan; *Erdnîgarî*, *Hêz*, *Rehberî* û *Dewlet* . A niha jî, de werin em hinekî li ba yekemîn rasteqînên dîrokê rawestin, ew jî bidestxistina erdnîgariyê ye.

## Erdnîgarî û Navkokî:

*Morîs Dovirjê* dibêje: „***Erdnîgarî (Cuxrafî) keça dîrokê ye, bi qaserî ku diya wî ye***„[2]. Bi rastî eva gotineka nirxbihaye, û çaxê erdnîgariya gelan binpê dibe gel diherifin û hildiweşin, lewre, ji berbanga dîrokê de navkokî di navbera gelan de ji bo bidestxistina erdnîgariyê xort bû, tê xuyan ku di paşerojê de dê xorttir bibe, ji ber ku jimara mirovan roj bi roj bêhtir dibe.

Li ber ronahiya va rasteqînê emê karibin pir cengan li seranserî cîhanê diqewimin şîrove bikin, bi serde jî emê karibin bizanibin ji bo çi dewletên gewre hewldidin ku destên xwe deynin ser cemesera bakur û başûr, û ji bo çi ev berebaziyên wan li ezmanan.

## Hêmanên bidestxistina erdnîgariyê

**1 – Kendûkor û Heyam:** Bê guman, kendûkor û heyam (etmosfîr) roleke mizin di jiyana mirov de dileyze, bi gelemperî mirov ji erdnîgariya biyaban (Berrî) germepir û sermepir (wek cemesera bakur û başûr), bazdide, daxwaza wî ewe ku ew nişteciyê erdnîgariya orteheyam be, û xwdiyê axeka zengîn û pir baran û av be.

Bi gotineke din; erdnîgarî bi du rengane:

- **Erdnîgariya Birçîbûnê:** Ew ergnîgariyeka qels û belengaze, nikare pêdiviyên jiyanî pêşkêş bike, ew niştecîyan diqewtîne, dike penaber.

- **Erdnîgariya Têrbûnê:** Ew ergnîgariyeka dewlemende, pêdiviyên jiyanî bi hêsanî pêşkêş dike, niştecîyan berve xwe dikşîne.

Li dirêjahiya dîrokê, niştecîyên (erdnîgariya birçîbunê) êriş dibirin (erdnîgariya têrbûnê), da ku bixin bin destên xwe, û jiyaneke xweşik têde derbaskin, helbet navkokî di navbera êrişvanan û niştecîyan de diqewimîn, û bi piranî êrişvan bi ser diketin .

Wek nemûne; êrişên Ekkadiyan li misopotamiy dor (2300 b.z)ê, û êrişên Emuriyan li Sûrya, êrişên erebên Islam li misopotamiy, Sûry, Yemen û Misir di sedsala (7z)ê, û êrişên Muxolan li welatê Çîn, Hindistan, Efxanistan û deverên rojavaya Asya di sedsala (12 z)ê [3]

**2 – Dahatî û Bazirganî:** Eva hêmana duweme ji hêmanên bidestxistina erdnîgariyê, ev hêmana bi tûnd girêdayî hêmana (kendûkor û heyam)ê ye, lê di her serdemê de rengekî xwe yî taybetî heye, ji ber ku piştî mirov ji rewşa (komikî) derbasî rewşa (êlî) bûn, û di pey re ketin bin sîwanên dewletên neteweyî û olî, pêdiviya bidestxistina erdnîgariyê ji pergala xwastekên ûr (xwerin) derbasî pergala xwastekên şaritaniyê bû, ew pergala ku jimartina mirov têde bêhtir bû, û qesr û olgeh sazkirin, û bazirganî têde peyda bû û bi pêşve çû.

Wek nemûne; Ekkadiyan, Babiliyan û Aşuriyan êriş birin ciyayên Kurdistanê û ciyayên Emanos li nêzîkî Derya Sipî, da ku text , mêtal (filiz), mermer û kevirên nirxbiha ên din bi destxwexînin, û wek nemûne jî êrişên dagîrkerên ewrupî li ser deverên Asya, Ffrica û Emêrka, ji bo ku destên xwe deynin ser dahatiyên wan deveran.

Wek nimûne jî; rola bazirganiyê di çarçewa pirojeyên êrişvaniyê de, ji ber ku rêyên bazirganiyê ên cîhanî, di her demê de, rêyên çar mirovan bûn: Bazirganvan, oldarvan, konevan û êrişvan, û ciyê balkêşiyê ye ku cîhana kevin ji sê bejan bû (Asya, Ewrupa, Efrika), û bejê herî giring ji hêla demografî û aborî de bejê Asya bû.

Di cîhana kevin de, du rêyên bazirganiyê ên giring hebûn, û dikirin ku gelên cîhanê bi hevre têkildar bibin:

– **Rêya Herîr:** Ev rê ji welatê □în de dest pê dikir, û di deverên orta Asya re derbasî Kurdistan û Misopotamya dibû, li wir dibû di şax; şaxek berev Enadulê diçû, şaxê din jî biyabana Sûryê derbsdikir, û digihîşt beravên Derya Sipî.

– **Rêya Bixûr**: Ev rê ji başûrê rojavaya Asya de- bejayî û deryayî- dest pê dikir, û digihîşt benderên başûrê Yemen, di pey re di rojavaya Erebistanê re berve bakur diçû, ta digihîşt benderên Derya Sipî, du şax jî berve Misopotamya diçûn, û şaxek jî berve bakurê Misirê diçû.

Bi kurtî; li deverên Misopotamya, rojavaya Kurdistan, Enadol, Sûrya, Libnan, Filestîn û bakurê Misir, şaxên Rêya Herîr û Rêya Bixûr digihîştin hev, û ji benderên Derya Sipî rêyên bazirganiyê ên deryayî derbasî başûrê Ewrupa dibûn, û bi vî awayî her sê bejên cîhana kevin bi hevre dihatin girêdan.

Eger em rêyên êrişvanên xwedî pirojeyên dagîrkeriyê di ber çavan re derbaskin, emê bibînin ku ew jî di herdû rêyên bazirganiyê û şaxên wan re diçûn û dihatin.

Çi dibe jî, pêwîste Kurdistan were rêzgarkirin!

1 - Gaston Botol: Zanista diplomasî, rû 103.

2 - Morîs Dovirjê: zanistcivakiya diplomatik, rû 56.

3- Cîn Potro û hin din: Rojhilata nêzîk û Şaristaniyên pêşîn, rû 70, 62. Y. I. Kitşanov: Jiyana Tîmoşîn (Cingîzxan): rû 263 – 264. Ebû Elfida; Kortenûçeyên Mirovan, beş 3, rû 193 – 194.



Pirê Heşirkê – Mêdunkê kevin

www.arsivakurdi.org

**Dr. Mehmûd Ebas**
mamokurda@gmail.com



# Guman

helwest û mîjok û jiyan bi tevahî têne pêşketin yan guhertin, wergerandin her tim derdikevin, daxwazî û meyzandin, demne bi pêşve û demne bi paşve têne beyanîkirin, Ev bi gotna navberî de, di warê (ilmî) de, lê mîjokvanên (nefsî) nikarin heya vê rojê bighin warekî ku mirov bixê seknandina daxwaziyê de. Nikarin bixwiyanî bidin, bê mirovek her tim kêfxweşe yan jî bi hêrs e. Di vî warî de pêşketin û ferhbûne helwesta sikolocî bi arikariya gumanê tê xwiyakirin.

Wê çilo ba, ku di warkî mîjokî de . bi serê xwe, bi tena xwe, jiyana mirovatiyê hatibe danîn? Her tim kes kifxweş be, yan her tim lerizî û xeyidî û kelexî (qeherî) bana, yan jî şahî û xemgînî ji bîra wî necûba? Pirsa yekemîn, wê zanestiya mirovatiyê pêşketîbe ?

Pirs bi giştî gumanekê didê xwiyakirin, ka mirov têde çawa di meşê û helwestên xwe dişopîne, û dipêjinê ku jiyanke xweşî û zordest, û lerezbûn, qeher, û xemginî…li cem mirovan her tim çima di guhertinê de ye? mêjî kar dikê û wilo jî xwe rehet dikê, bê çilo di pêjinê wilo ji di kevê gumanan û xeman de. mirovê bi jiyanê hêdike qayêl dibin hemberî yê ku dixwazin jiyanê tevlihev bikin pêşketne şehrezayê ser rastikin, di navbere wa de guman amada ye, ji hevdû û ji der dora xwe ne xweşin, kesê daxwaziya şer û xirabî di wan da hatiya çandin himberî kesê bi aştî der dikevin li ser riwê vê zemînê, û sedem ji vê himberiyê re têne avakirin, jiyan wê bi rêve neçê di wekheviyê de.

Newekheviya jiyanê mîjokê ji hev derdixê, ew bingehê pêşketinêye, bê cudabûnan û newekheviyan şehrezaiytî nayê avakirin, û şehrezabûn bi pêşnakevê.

Hebûna kesê ku pir dipêjinin û pêjnên xwe dixine bin bingeha gumanan de, ê ku pir di kelixin, ê dipirsin û li dûv zanistiyê diçin, û ê tembel û her wehe kesên din…, jiyanê didine beynîkirin, pirsa kesayatiyê zelal dikin, lê bersivê nikarin bidin, û ev hemû bi gumanêve girêdayîye û bi wê pêşkêşdibê.

Pirsa ku xwe pêşkêş dike, guman bi xwe çiya? û çi xweşî û naxweşî ji derdikevin? û çima li cem hin mirovan xurte û li çem hine din melûle? Ev pirs ji nav gelek pirsên din bingiha dexwaziye pir kesaya.

Bê çilo felsefê li ser warê gumanê ferehbûna zanistê avakiriya, wilo jî sofîtiyê li ser mîjoka habûna xwedê li ser avakirya, dijî behweriyên olperestiyên xwedayê, û bahwerî bi habûna piştî jiyanê aniya, û di nav da pêjiniya û kûr xebitiya, û li ser sedmên hebûnê sekiniya û pirsên bi guman danîne ber xwe.

Di navbere herdû beşê zanebûnê de ( Madî û rûhanî) jiyan û sedmê hebûna wê, ketiya warê zaf cuda de, û gelek pirs dimênin ne xwiya, û ne naskirî, li ser ku nakokiyê xurt di navberê de hatine avakirin, wilo ji warin mîjokî ferh kirine, li cem kesr û derdê oldestê ji bona habûna xwedê ne sekinîne û karkirine ku nepirse we li ser xwedeyê bê guman windabikin, û bi vê xebatê mirov ji pirsên bi guman dûr neketine.

Lê pirên olperistan li dûv bîr û behweriya mirovatiyê xwe jibîrkirine, di bin kolê dînbûne mêjokî, yan ji ya oldestî, hatine girêdan bi ruhaniya bi pirs û bê guman ve, bahwerî di warê mirnê de maya di bingehê gumaneke fereh de.

Zelal kirna rewşenbiriyê û zanebûna mîjokî, ji pirsên bi guman dest pêkiriye, ewê riyê eva kirne şehrezayê ya bi semiyan, û fereh û bê sinor û bê dawî.

warê nezelaliya rewşenê û wê de, bi gumanê, mîjokê kûr li derdora mirovantiyê peyde bûne û peyde dibin, û şaxê pêjinê, bi pirsê gumanî, ferhbûne, û li ber ti sînorê wê nasekinin, ji bonî daxaziyê beyaniya sedmên hebûn û şeherzabûna mirovatiyê peydebûne ji destpêka dîrokêve bi kûrbûn.

Ev mîjok çarçeyê giftûgoya firehkirine, û fereh dikin, û pirsê giring li ser sedema hebûna jiaynê dane xweyakirin û her tim pêşkêş dikin.

Guman, wek pirseke bê dawî û bi gelek bersiv, destpêkê mijûlbûna mirovane, û avakirna çandê bû. Di destpêka zanabûnê de, dema ku mirov ji zaroktyê derdikevê yan ji dema ku ew ji çarçevê hovîtiyê cuda bûye, li ser vî warî pirsê wî zêdebûne, û kûr bûne, wek pirsê zanebûna mirovatî, calakiyên ji bo jiyanke xweştir, û pêra gelek sedemê avakirina şehrestaniyê û rexnandinê wê hatine xwiyakirin.

Pirs di warkî de ne rawistihaye, piştî demekê ji mijûlbûna mirova mîjokî, bingehên zanistiyê hatine avakirin û pêşketin, di wê demê de felesûfê herî xurt, ji gumanê zanebûnê xwe dest pêkiriya,

li cem wa wek pirseke her tim bê bersiv cihê xwe girtiye. Her weha piraniya ola – bi teybet olên xwedayî ( Azmanî )- binghe bîr û beherê xwe avakiriye li ser pirsên bi gumanêve girêdayî, û xwestine habûn û nebûna xwedê ji vî warî derxin, çarçavk hişk û bilind li dora gumanê avakirin, pirs kirne warê ( kufrêde ) bi kesayatiya ku hemû bersivê xwe xistine destê wî de û navê wî kirne ( xwedê) û wilo olperstiyê xwe ji mîjokê gumanê bê bersiv parastin, ew jî heya demeke ne dirêj, dîse guman li dora wê fereh hatiya hûnandin, xwedê mijarê bê dawî hatine pêşkêşkirin, piraniya wê bi xelekên Sofîtiyê ve hatine girêdan.

Guman wek pireske bi mîjokî, bi pêşketina mirovan re û bi demê re fereh dibê; û her tim cihê xwe digrê li cem her kesên ku bi azadî li jiyanê dimeyzênin, û amadebûna wan dibê wek meyzandineke bê çar, di ber barê her tişî de di rabê, bê ku bighê taliya pirsan, û ew jî bi pêşketine mêjokê ve girêdayîye, û bi tayibetî di navbera her dost û mirovekî de, guman ne hatiye avêtin, li ber her daxwazekê pirsê lerizî û bê bingeheke bi behwerî derketiye . Di warnan de daxwiyakirna wê dibê sedma jiyanke xirab û nexweş.

Rewşenbîr û feylesûf û rêberê olperistiyê gihane armanca xwe, di warê ku pirsê xwe xistine bin tirsa gumaniyê de, her beşekî ji wan, bi rêke cuda, û wek pirseke bê azadiya mîjokî birine ser şaxê jiyanê bi tevahî, bê çilo li ser jiyana mirovan sekinîne, wilo jî kûr li ser (xerîza) di navbera mirovan û dewaran de karkirine, û her weha li ser hemû çarçewê di jiyanên de sûrûştê de (tabiaa) pêjinîne, di bersivên pirsên gumanên xwe bidin, û xwe bi bîr û behwerî bikin.

Li ser sedemê hebûna jiyanê, bi gumanî wek kesê ne olî, fereh guftûgo û xebateka mîjokî hatiye kirin, gotinên we ji warên olperistiyê cuda dibin, xwedê nabînin berpirsiyarê jiyanê û hebûna wê.

Di dîrokê de nehatiye xuyakirin ku kes û tişt nayêne guhertin di warê xemgînî û kêfxweşê de û tirsa ji mirnê û pêde .

Kasê wilo di kevine jiyaneke bê xem de, û çi karekî bitirs û zor û xeter habê xwe di wirde dibînin, ji ber ku jiyan li cem wa nema buhaya.

Di vê ramanê de, guman di hemû warên xwe de û hemû çarçevê li ser pirsan, tê xwiyakirin bi hemû rengê xwe ve, wek mirov di himberî jiyanê de, yan jî di warê bîr û bahweriyên xwe de li hebûna piştî jiyanê, rojê wekhevî di jiyana kesan de çi li cem we didê pêşkêşkirin, bi taybet dema ku temenê xortê gelek guhertin têde çê dibin, herkes dibînê û dihnê xwe didiyê û guman di vê demê de cihê xwe digrê, lê pirsê bi guman û bê behwerî bi kesê li ser wara dimênin û dikevine warên giftûgoyan de, û eve ya ku lebitandinên xorten ên mîjokî ji her rewşenbîrekî şehreza têxwestin, ku riya pêwist ji wan re pêşkêş bikê…. her tim û di her warî de pirsên bi guman dimênin ên herî giran, û pêşketî.

……………

Ev rûpel in ji pêşgotina ramana min a bi navê (Guman) hatiye nivîsandin , di sala 1973an de.

www.arsivakurdi.org

## Kemal Tolan



# KURTİYEK Jİ DÎROKA ÊZDÎTİYÊ Û HİNEK AGEHDARİYÊN Lİ SER CÎH-WARÊN ÊZDİYÊN KU Lİ BAKURÊ KURDİSTANÊ DİMAN

Li goriya dîtina min , gava meriv dîroka xwe ya kevn baş nas neke, meriv nikare dîrokeke nû jî rast baş biafirîne. Her çiqas hinek dîrokzane û lêkolînvanvên di dinya yê de pir bi navûdengin, di nav lêkolînên xwe yên li ser mirovatî, mîtologî(qewl, duha, beyt, sed û hed), ziman, civak, çande, xak, stêrk, efsane, destan, çîrok û akademînasînê de li ser afirandina dinya yê rawestiya bin jî, tu kesî nikarîbuye-nikare vê kuraya ku di nav baweriya ilmê(zargotina) Êzdîtiyê de hatiye gotin û vêga hêjî tê gotin, *„di kaînat û dinya yê de Xwedê yek heye. Gava Milyaketan li ber heyiya Xwedê, kaînat û dinya ji bona berjiwendiyên giyanderan xemilandine , ewan hingê pêwîstî bi alîkariya tu beşer anjî pêxemberan tûnebû ye. Xwedê û Milyaket vêga hêjî ne hewceyî alîkariya tu qazid anjî hêza giyanberên ku wan bi xwe ew afirandine. Xwedê û Milyaktan başî û nebaşiya jiyana giyanberan(ne ya mirovan tenê) ji kiryarên wan ra hîştine "* şîrove bikin. Lewma ez jî dibêjim, **xêr û şerên mirovan di dilê mirovan de ye . Gava kî ji bo Xwedê be, Xwedê jî ji bo wî/wê ye !.**

**EZDAHÎTÎ maka hemû mîtologiyên xwezayî û pirtûkên pîroz e!„*1.**

Bêguman, mîna ku di nav zargotina Êzdahîtiyê de hêjî tê gotin, „haveynê dinya ji aliyê XWEDA ve hetiye meyandin û heta niha dû tûfan li ser kaînat-dinya yê çê bûne." Wisa gelek ji dîrokzane û lêkolînvanên hêja jî, di nav lêkolînên xwe yên pir watedar de didine xwanê ku; " şarîstaniya mirovatiyê ya berî û piştî tûfanê li serê çiyayên Kurdistanê dest pêkiriye. Erdnîgariya Kurdistanê dergûşa afirandina gelek tiştên çandinî û mîtologiyên xwezayî ye **….*2".**

Lewma ez jî li goriya zanîna xwe dibêjim - *ezdiyati-haveyne-mirovatiya-mezopotamiya* ye ***3**

Ji xwe di dîroka hatî guhastin de jî tê xwanê kirin ku, dagirkerên welatê me, carnan jî bê hemdî xwe mecbûr bûne ku, di nav hinek dokûment û lêkolînên xwe de, mîna ku di zargotina bav-kalên me de hatî gotin bibêjin, tevaya çiyayên li ser axa Mezopotamiya yê hene, "heta 2000 sal berî zayînê ciyê wergehên **Hîtît,** Gutiu(miroven cengawer), Gutyu, Gardu, Kardu, Kurdu, Halti(***4** bi xwe jî di rûpelê 45 de dibêje: -ev Êzdî bûne-, **Haldi** û hwd. Wekî dinê jî," di hinek dokumentên li ser dîroka Med, Fariziyan û lêkolînênvanan li ser dîwarên hinek şikeft-zinarên li derdora Wanê dîtine de didine xwanêkirin ku, tevaya serê çiyayên Kurdistanê ciyê kevneşopiya Mîtologiya Haldî(Xalti)ya ye.

Çewa tê zanîn, min jî di lêkolîna xwe ya bi navê **Em Kurd tev mina şeyen ji dareke ne *5** de mîna gelek ilimdar, dîroknas, nîvîskar, rewşenbîr û rojnamevanên navdar zelal daye xwanêkirin ku gotina miletê Xaltî anjî „Kaldî", „Xaldî", „Xalidî", „Haldî", „Halidî", „Alarodî", „Khaldî-Xaldi", „Xalid" û whd., ji wexta dewleta Hurriyan tê.

Weke ku di nav hinek rûpelên dîroka derbasbuyî û zargotina me de tê xwanê kirin, gava mîtîngehker hatine Kurdistan bi şûrê zorê dagir kirine pêve, êdî ewan bi alîkariya hinek olperest- begên Kurdên paşwerû û şêwirdarên Ewrûpayiyan, tovê bêtifaqî û neyartiyê jî berdane nava civaka Kurdî ya herî qedîm.

Lê, **XWEDA** şada ye ku, piraniya bav-kalên me ÊZDIYAN di her wextî û di her cîhê ku lê jiyane de, li himberî zilm û xezeba mîr, beg, axa û artê□ên dagirkeran li ber xwe dan e, ew teslîmî wan kevneperest, olperestên fanatîk, bêbext, nijadberestên xwînxwar û hovane nebûne. Lewma divê em **ŞARİSTANİYA KU ÊZDİYAN Lİ SER ERDNÎGARİYA KURDİSTANÊ DESTPÊKİRYE NASBİKİN Û BİPARÊZİN!** (û*6)

Hinga dagirkeran Kurdîstan bi peymana Qesra Şêrîn (di sala 1639de) cara yekemîn perçekirine, hingê jî bav-kalên me Êzdiyan gelekî li dijî vê perçekirina Kurdistanê derketine. Lê, bav-kalên me Êzdiyan, êdî ji ber talankirin, şer û êrîşên dagirkerên Kurdistanê nikaribûne azadiya xwe biparêzin. Ew mecbûr bûne di nav welatê xwe de, mîna me yî vêga cîh û warên xwe timî li goriya rewşa desthilatdarî, aborî, astengî, sar û germiya xweza(hewa)ya herêma ku lê jiyan dikirin bi guhêzin.

Min di nivisînên xwe yên ku hatine belakirin de jî gelek caran gotiye „ Piraniya çîrok, mesele, ayet, lêkolîn, berhem û hemû dîroka ku alim, zane, nivîskar, partî û rêxistinên dagirkerên Kurdistanê li ser dîroka netewa Kurd û bi taybetî jî yên li ser Êzdiyatiyê nivîsandine anjî gotine qet bi kêr nayên. **Agehdarî û zanîna me kurdan li ser dîroka kurdayetiyê û rewşa cıvakan êzdiyan pir lewazin *7.**

Ez li virê dîsa lavan ji ilimdar, alîm û dîrokzanên me Kurdan dikim û dibêjim,

îro ji her rojê pêwîstir tê xwastin ku hûn jî bi yekîtî, ilmî, zanistî û bêtirs ji me welatperwerên Kurd ra bibêjin, ka maka bawerî û dîroka me Kurdan ji Ezdahîtî, "Gutî", "Sumerî", "Arî", "Oryantalîstên Îranî", "Hînt-Awrûpî", "Kardu-Karukî", "Urartî", "Medî" anjî ji "Ereban" li kurê û kengî destpêkiriye?

Li goriya agehdarî û zanînên ku min ji nav zargotina me Êzdiyan û ji nav hinek çavkaniyan berhevkirine, hinga ku Êzdîxan ji Êzdiyan dagirtî bû û sînor ne ketibûne nava Kurdistanê, hingê Êzdî di nava Mezopotamiyayê û bi taybetî jî di nava Kurdîstanê de bi serhevûdin ve, bi hêsanî çûne û hatine. Lêkolîn didine xwanê ku, pêşiyên me "Kurdên Resen" çande û netewiya xwe di nav mîrgehên mîna:

"Mîrgeha Şengalê(mîrê wê Şerfedîn bû.), Mîrgeha Helebê(mîrê wê Şêx Mend bû), Mîrgeha Soran( mîrê wê Şêx Mhmedê Batinî bû), Mîrgeha Herîrê(mîrê wê mîr Hesin Meman bû), Mîrgeha Tewrêzê(mîrê wê Şêşimis bû) , Mîrgeha Diyarbekir( mîrê wê Şêxubekir bû.), Mîrgeha Badînan yan Amêdiyê( mîrê wê Amadîn bû.)*8:a- rûpel 21 û b- rûpel :4)" de parastine.

Tiştê ku ez dizanim, êdî tu kes ji me hew dikare bi tam temamî bibêje, ka bav-kalên "Kurdên Resen" ji xeynî serê çiyayên Mezopotamiya, Asya û welatên Ewrupa yê pê ve, bi kûdera dinayê ve heribî ne. Li goriya zanîna min, Êzdî vêga hêjî li nava herêma başur-rojavayê Kurdistanê (li Sûriyê dora 25.000 kes), başûrê Kurdistanê (li bakurê Îraqê dora 700-900 hezar kes), rojavayê Kurdistanê (Îranê ?), di nav gelek welatên Sovyeta berê de (li Ermenistanê- dora 40 hezar, Azerbaycanê dora 20 hezar, Gurcistanê dora 20 hezar, Rûsiya dora 30 hezar, Ûkranîa û hwd.) û li bakurê Kurdistanê (li Tirkiyê dora 500 kes ), li Ewrûpa(Almaniya dora 30-40 hezar, Şivêdê 4000 kes, Belçika, Holanda, Denemark û hwd.) de dijîn.

Li goriya ku min hinek agehdarî ji nav zargotina me Êzdiyan û ji ber hinek lêkolînan tomarkirine,

Êzdiyên ku **li bakurê Kurdistanê diman, heta sedsala 19 an jî li nav van mîreghan de mabûn(*9) :**

„ Mîrgeha Xaltiyan û Bota (Sêrtê)

Mîrgeha deşta Diyarbekrê

Mîrgeha Riha- Urfa yê

Mîrgeha Cizîrê û Mêrdînê

Mîrgeha Hekkariyan û Serhedê (Qars)

Mîrgeha Mereş, Nizîp, Meletê û Kilîsê

### HERÊMÊN MÎRGEHA XALTÎ Û BOTİYAN

Eşîrên Êzdiyên Xaltî û Botî ya li derûdora wilayeta Sêrtê û Batmanê diman.

a - Êzdiyên ku li derûdora Mîrgeha Xaltiyan, ji wan re dibêjin **Xaltî** (Tenê Êzdiyên li vê hereme dijiyan re dibêjin Xaltî. Eşîrên wekî olên, Musilman û.hwd. nabêjin "em Xaltî ne.")

b - Êzdiyên li derûdora Bota, ji wan re dibêjin **Botî** anjî Basî.

### EŞÎRÊN Dİ NAV MÎRGEHA ÊZDİYÊN XALTİYAN DE DİMAN EV BÛN

**1.Xendeqî, 2.Qizilî, 3.Neqîbî, 4.Angosî, 5.Bisiyan, 6.Bletinî, 7.Emeran, 8.Mamereş, 9. Basa, û whd.**

### 1.XENDEQÎ

**Warên Êzdiyên Xendeqî**

Ji çiyayê Bûzêrî ya û ji ber ava Heskîfê (Hesenkêfê) heta pira Batmanê û ji ber ava çemê Delan ji milê rastê heta Kêl û Midêwrê (Ridwanê). Heta dema petrol li çiyayê Reman derneketibû û heta navên Kurdî di sala 1934'a de ne hatibûne guhastin, Kurd û Êzdiya ji van war û çiyayên di nav herêma Heskîf û Batmanê re digotine **"Çiyayê Xendeqiyan."**

**Hinek ji Bavikên Xendeqiyan yên hêjî hene ev in:**

Himeydî, Axikî, Reşî, Geverî, Veysikî, Îdikî, Qadoxkî, Kaşaxî û whd.

**Navên hinek gundên ku Êzdiyên Xendeqî lê diman ev in:**

Baherziq, Barisil, Basorkê, Bazbût, Bazîwan, Bêdalê, Çinêriyan, Dêrikê, Feqîran (Pîrê Zeynîka), Gêdûk (Kaşaxî), Girê Reş, Keverzo(Êz.Fil.), Korik (Êz.Fil.), Malê Biniyê, Memika Pêşîm, Mezirka, Mirdêsî, Mizareşê, Qulibdor, Sîlexer, Sinê(Bakuftê), Sîxura, Şahsim, Şêhê, Şêkesteke, Şimzê, Zercil (Êz. Fil.), Zêwa Mîran (Ziyaretbû û Feqîr tê de bûn).

Ji bo ev navên gundên Êzdiyan yên bi Kurdî, ji vir û weha de jî bêne kufşkirin û wenda nebin, min lewma navên gundan yên bi Tirkî ne nivîsandiye.

Em dizanin, niha jî di destên Ezîdiyan de Tapo (qoçan) yên gelek gundan hene û herkes jî dizane ev êrdan erdên kê bûne. Lê ji ber ku hemû navên wan di kûtukan de hatine guhastin, êdî Êzîdi hew karin di rêya qanunan de dawa milk û talanên xwe bikin.

## 2.QİZİLANÎ

**Warên Êzdiyên Qizilî**

Ji ber Ziyerata Şêxevindan û Awîskê (ku li ber Çemê Delan e) li ser milê çepê heta diçe Bilwerîs (Çêlikê Eliyê Remo û Ridwanê) û heta diçe Çiyayê Xerzan (Gurdilan û Bîrika Kurêdiyê) .

**Hinek navên bavikên Qiziliyan ku hêjî hene ev in:**

Amerkî, Metînî, Takorî, Şemsikan û Bavbina û whd.

**Navên hinek gundên ku Êzdiyên Qizilî lê diman ev in:**

Aşik, Bêleka, Bêtam Kanî, Bîrka Kurêdiya, Cim Sarîbê, Cimzeq, Darosel, Dûsadek, Ênxala, Girê Çelo, Hemdûna, Sorkê (Pîr.Hesmanan), Kelemaran, Kuşana, Marîpê, Mêrga Êlî, Milêha (Gund.Kîr.Şêx Mîrza), Qumaro, Ridwan, Sulan, Terno, Şêx Osel, Şêx Ûnis, Şêxevinda Xe, Wahzdê, Xanikê, Xindok, Xindûka, Zengav, Zêwika Şêxan, Zorava, Zuxêr, Qinask Feqîrê Ormaxal, Dêra Hemzo (Metînî), Şikevtê Emer (Metînî), Duşa (Metînî).

Ji bo ev navên gundên Êzdiyan yên bi Kurdî, ji vir û weha de jî bêne kufşkirin û wenda nebin, min navên gundan yên bi Tirkî ne nivîsandiye.

## 3.NEQÎBÎ (REŞKOTÎ)

**Warên Êzdiyên Neqîbî**

Ji çiyayê Qozlix- Gaza Kursî- hetanî ber Sîlvanê (Tepa Berava û Pira Mala Badê) û Bekir-Şêx Doda.

**Hinek ji bavikên Neqîbiyan yên hêjî hene ev in:**

***Şedikî, Şewrikî, Mehemedkiyê Rêza Gundî, Mehemdekiyê Dermankî, Pîvazî, Kavarî, Dirbêsî, Denî***(Di zargotinên me de jî tê xuyanê ku Denî eşîreke kevn û bela ne. Gelo çi girêdan di navbera vê eşîrê, ya heremên deşta Herrana Sûruc û Nizîpê, deşta Wêranşehirê, deşta Qiziltepe û Dêrika Çiyayê Mazî, deşta Amedê û yên li Xaltiyanê de hene?), **Berekî** (Herêma eşîra mala Çelikê û mala Zirçî Axa lê diman re tê gotin) ***û whd.***.

**Hinek ji navên gundên ku Êzdiyên Neqîbî lê diman ev in:**

Alavê, Apka, Awîska Êlî, Awîska Omo, Bîmêr, Bolindê, Cerdeka, Darabiyê, Dela, Dêra Qêre, Dirbêsa, Eco, Enapê, Germik, Gozel Derê(Güzeldere), Gundikê Golo, Hecir, Helwîk, Herfasê, Hêşhêşê, Hethetkê, Hiznemîr, Kaçka, Kara Xwê, Gaza Kursî, Kela Şêxevindan, Kelhok, Kurtikê, Liçkê, Malegir, Mêrîna, Mîlka, Newalê, Qorix, Qubîn, Şêxevinda (Ziyaretbû), Tapoyê (Tapî), Texerî, Zivingê, Baximiz ( Berekî-Çelkê), Baximiz ( Berekî-Çelkê), Cinesker ( Berekî-Feqîr), Dumbêşkê (Berekî), Êynkerm ( Berekî-Feqîr), Êzika Jor ( Berekî), Êzika Xwar (Berekî).

Ji bo ev navên gundên Êzdiyan yên bi Kurdî, ji vir û weha de jî bêne kufşkirin û wenda nebin, min lewma navên gundan yên bi Tirkî ne nivîsandiye.

## 4.ANQOSÎ

**Warên Êzdiyên Anqosî**

Li rêya Awîskê-Qurtelanê heta Sêrtê û Geliyê Bitlîsê. Paytextê Anqosiya Koçika Gûmêrdî bûye.

**Hinek ji bavikên Anqosiyan yên hêjî hene ev in:**

Batranî, Reşî, Canikî, Dena, Stûrkan û whd.

**Navên hinek gundên ku Êzdiyên Anqosî lê diman ev in:**

Li gorî zargotinan, berê 67 gundên Anqosiyan hebûn.

Başûra, Ênapê, Sorik, Canika, Daqotê (Gundê Şêx Mîrza ye), Sewdîq (Denî), Bey Satûn, Zozanê Şêrînê, Kezerê, Betran, Kelhok, Berhurik, Gumerdê, Xişêna.

Ji bo ev navên gundên Êzdiyan yên bi Kurdî, ji vir û weha de jî bêne kufşkirin û wenda nebin, lewma min navên gundan yên bi Tirkî ne nivîsandiye.

## 5.BİSİYAN, 6.BLETİNÎ, 7.EMERAN, 8.MAMEREŞ

Nivîskarê Ereb S.Balucî, di sala 19000 de çûye li nav heremên Êzdiyên bakurê Kurdîstanê geriya ye û li ser rewşa Êzdiyan nivîsiye. Wê demê de li ser van eşîrên Êzdiyên Xaltiya gotine: "Ev eşîran Bisiyan, Bletinî, Mamereşa (civata Mamereşa) li Aqçeqelê bû (2:320)", "Emeran a berê Êzîdi bûne, lê ew vêga li herêma me de heliyane û nemane (3)"

## 9.BOTA (BASA)

**Warên Êzdiyên li Basa**

Êzdiyên Basî, li der û dora Sêrt û Eruh (Dêhe) bûn. Dîsa: "Gundên Êzdiyên Basî, dikevine nava wêlayeta Sêrtê li herêma Qeza Dihê (Erûhê) û çiyayên Keverê heta ava Mîrgeha Botanê. Pêşiyên Basa ji Xalta (ji Neqîba) hatine Bota û dema fermalû dibin dîsa hinek ji Basan xwe li Xaltan girtine.(4:32-38)"

**Hinek ji navên eşîrên Êzdiyên li Bota ev in:**

**Şedikî, Basî, Hewêrkî, Dinbilî** (Tarîxa vê eşîra Êzdiya ye kevn û sereke diçe digîje wextekî dûr, "di destpêkê de mîr eşîretên Dinbilî girêdayî dînê batinî yê Êzîditî bûne (2:325) û ya rast ev e ku eşîreta Dinbilî û Mehmûdî gelek kevin de ji Cezîrê derketine (2:158)." ***û whd.***

Hinek ji navên gundên ku Êzdiyên Basî lê diman ev in:

Berî fermanê Basiyan (14.5.1916), gelek gundên Êzdiyên Basî hebûne û Di wexta fermanê sala 14.5.1916 de, 350 heta 400 evdên Êzdiyên basa hatine kuştin.

Basa Êzdiyan, Basa Siloyê Ferho, Butara û whd.

## MÎRGEHA ÊZDİYÊN Lİ DEŞTA DİYAR BEKİRÊ

**Warên Êzdiyên li derûdora Amedê**

Êzîdî li herêma bajarên Farqînê, Bismilê û Çinarê diman.

Hinek ji navên eşîrên Êzdiyan ku li derûdora Amedê diman ev in:

Xendeqî, Qizîlî, Neqîbî, Suhanî, Baravî, Dawudî û whd.

**Navên hinek gundên Êzdiyên ku li derûdora Amedê diman ev in:**

Asinc, Başko, Baxçeçik, Bosbar, Caferkê, Celebdar, Çemê Reşa, Çetelê, Cilibdar, Dareqol, Dawidiyê, Dêrik, DikênîMele, Diş, Girhebeş, Heyderqul, Kaci Xaskê, Kanîsipî, Kelemo, Kifrê, Koçik, Meforatê, Melcabir, Mele Eliyê Jorîn, Eliyê Xwarî, Melkîş, Merkotatê, Mezirê, Misilmanî, Mîr Qûliya, Mîrza Bega, Perîşanê, Qarqartik, Qerepal, Qipik, Qizilê, Qozel Şêx, Sarê Hisseyin, SAlman, Seydekê, Sînanê, Şêx Çopanê, Têlabûş, Tilhebeşê, Tirbesipî, Tawisî, Qencoxas, Mîr Êliya.

Ji bo ev navên gundên Êzdiyan yên bi Kurdî, ji vir û weha de jî bêne kufşkirin û wenda nebin, lewma min navên gundan yên bi Tirkî ne nivîsandiye.

## MÎRGEHA ÊZDİYÊN Lİ DERÛDORA RUHA (URFA)YÊ

**Warên Êzdiyên li wîlayeta Ruha yê**

Li herêma Bozova (heliyane), Nizîpê (heliyane), Suruc (heliyane), Sêwerekê (heliyane) û li Wêranşehîrê (mane).

**Navên hinek eşîrên Êzdiyan ku li herêma wîlayeta Ruha yê diman ev in:**

***Şerqiyan*** *(Merwanî, Bilikî, Hadiyan, Qopanî, Torinî(turunan), Suanî, Şengalî, Gergerî û whd.)*, ***Mastekî, Dawudî, Dena an jî Denî, Xaltî û whd.***

"Navên gundên Êzdiyan ku li derûdora Surucê yek jê Mes Hacerk e û yên li derûdora Bîrecikê jî Gundê Zak û Qostan e. (17:272)"

**Navên hinek gundên Êzdiyan ku li derûdora Wêranşehîrê diman ev in:**

Axmastê, Axmazut, Baluc, Başko, Birc, Bicanik, Çarçana, Festeqê, Gedê Kato, Gedê Naso, Girê Sirt, Hilhêlî, Hecî Zêdê, Îşxênê piçûk, Îşxênê Mezin, Kerma çem, Kerma Zoro, Kevirbelê, Kindor, Kimdor, Minminîk, Mozana, Mozikê Êzedîn, Mozikê sûrûciyan, Oxlakçî (Gundê Dewrêşê Evdî), Qorî, Qozberî, Qesra Hisseynî Qenco, Qizu açik, Suhaniya, Tiltirîq, Xerbê Ariyê, Xerîbê, Xirbekoyu, Xirbê Belek, Yaban, Zewran.

Ji bo ev navên gundên Êzdiyan yên bi Kurdî, ji vir û weha de jî bêne kufşkirin û wenda nebin, lewma min navên gundan yên bi Tirkî ne nivîsandiye.

## MÎRGEHA ÊZDİYÊN Lİ HERÊMA CİZÎRÊ Û MÊRDÎNÊ

Li ser rewşa eşîrên Êzdiyên li herêma Cizîrê (Bota) gelek nivîskar û lêkolînvanan jî weke zargotinê me gotine: "Gelek ji eşîrên li derûdora Cezîrê (Bota) diman, heta sala 639z ku hêja Îslamî qebul nekiribû ne, ew tev Êzîdi bûne. Li bajarê Cezîrê û derûdora wê, gelek keleyên sipehî û navçeyên balkêş hene. Di Nehiya Gurgilê de, li derûdora Çiyayê Cûdî de heft eşîrên mezin hebûne, sisê ji wan eşîran: Niwidkawun, Şoreş û Hîwdil eşîrên Êzdiyan bûn. Di Çavk.2 rûp:156 - 184 an de, navên gelek eşîrên Êzdiyan dinê jî hene. Gelek ji van eşîran heliyane û nemane. (2:156-158) "

# ÊZDİYÊN Lİ ÇÊLKİYA

"Bingeha Êzdiyên Çêlka digîji Mîrekên Cizîra Bota. Li ser fikra ku "hemû beglerê Cizîrê bi xwe jî, Êzîdi bûne(2:156)".

**Çêlkanî ji du heremên Êzdiyan re tê gotin:**

**Êzdiyên Qûlika** (Çolî- anjî Êzdiyên Qelaçê Dasika)

**Êzdiyên Torê (çiya).**

## 1.ÊZDİYÊN Lİ QÛLİKA (ÇOLÎ)

Berê ew li derûdora Cizîrê, Silopî û heta van demên dawî jî li derûdora Nûsaybînê diman.

**Warên Êzdiyên li Qulika**

Gava mirov li ser sînorê Tirk û Suriyê; ji gundê Hacîlo derkeve here Şamaxê, ji vir here Geliyê Pîra (Mezrê), ji vir here Rebena Bagilş (Kîwexê), ji vir here Bahminê, ji vir here Ewşê hete Badîbê, ji vir jî here Bîrgurya û Bagokê, here Qesra Belek û cardin vegere were Hacîlo. Ev hereman warên Êzdiyên Qulika bûn.

**Eşîrên Êzdiyên Qûlikan ku hina hene ev in:**

www.arsivakurdi.org

***Şêxê Berhokê, Bahcolî, Kelikan*** (Behminmî, Êvşî, Mihokî, Kîwexî), ***Dasikan*** (Berê li bîstûşeş gundan hebûn û pîrê wan ji binemala Pîr Eli ye), ***Hewêrî*** (eşîreke Kurdi ye, ne tenê Êzîdi her wisa Xaçparêz û Musilman jî hene), ***Seydokî û whd.***

**Navên hinek gundên Êzdiyên ku li herêma Çoliyan diman evin:**

Ahcîlo, Bamil, Baqurdan, Bazar, Berhok, Bêzdana, Birguriya, Dîrpû, Efsê, Êlîn, Evşê (Avşîn), Fisqîn, Geliyê Kelê, Geliyê Pîra, Geliyê Sora, Hebnat, Kemîna, Kengelok, Kirşê, Kunar, Mezrê, Mezrêya Rebena, Mişawil, Temeling, Mitwana Jor, Mitwana Xwar, Pelaşû, Pûlme, Qesira Belek, Qubika, Qulika, Sêlwan, Sêwilîtik, Spîwaniya Gelî, Tellê, Zirîqa, Şahrata, Şekrîn, Şemqî, Şûşaniya (Ewta) jorîn, Şûşaniya (Ewta) xarîn, Tilê (Ziwing), Xanika Şêxan, Xastû, Xirbê Cinatê, ,Xirbik.

" Piştî ku Êzdiyên ji eşîra Dasikan, demeke dirêj li dijî Osmaniyan şerkirin, mecbûr bun dev ji gundên xwe berdin û vêga kurdên musilman di gundên wan de dimînin. Navên hinek gundên Êzdiyên Dasikî ku li derûdora Îdil(cezîrê), Nuseybîn û Midyatê bun ev in:

1.Çemerlo, 2.Kengerlo, 3.Hacilo, 4.Kemine, 5.Serwan, 6.Xerbê Qandikê, 7.Kêrwan, 8.Mezra Sehîda, 9.Bêzdan, 10.Geliyê Pîra, 11.Geliyê Kelihê, 12.Şuşaniya jêr, 13.Şuşaniya jor, 14.Bazar, 15.Kunar, 16.Ziriq, 17.Balkurdan, 18.Kasirbeler, 19.Mitwêna jêr, 20.Mitwêna jor, 21.Fisqîn, 22.Qolika, 23.Xirbê Cinata, 24.Xirbêh Ramê. (19:48)"

Ji ewqas gundan, îro çend kesên Êzîdi tenê di gundê Mezrê de mane.

## 2.ÊZDIYÊN LÎ TORÊ

Êzdiyên vê heremê li derûdora Mêrdînê, li Midyadê û Kercewsê diman.

**Warên Êzdiyên li Torê**

Êzdiyên li Torê, heta van salên dawiyê di navbera van gundan de dijiyan: Gava ku mirov ji gundê Bacinê derkeve ber bi rojhilat ve biçe gundê Quzrê, Xêrbê Pêbinêrê, Bizê, Badibê, Kîwexê û ji vir jî cardinê were Bacinê.

**Hinek navên eşîrên Êzdiyan ku li Torê diman û niha jî hene ev in:**

***Botoka, Heloka*** (Eynoka), ***Misurka*** (Musurka-Musuka-Musana), ***Nasirkî, Bahcolî, Mala Teyêr, Dekşorî, Zeynikî*** (Zeyna), ***Şeroka, Çomerka*** (wêga kesên Êzîdi ne mane), ***Şivqetî, Simoka, Salîhkan, Hewêrkî, Botî û whd.***

**Hinek navên gundên Êzdiyan ku li Torê diman evin:**

Bacin, Badib, Baqik, Bizênka, Bizê, Bizêziyê, Cefan, Cixsan, Dêrwan, Gozikê, Hevindeka, Kasiya, Kefnas, Kîwex, Koçan, Mizîzexê, Nemîrdan, Qûbanê, Qûbika, Qudbê, Sifelî, Taqa, Xeraba, Xirbê Bênêrê, Xirbê Hûrîka, Xirbê Reş, Xirbê Xelo, Yucan.

Ji bo ev navên gundên Êzdiyan yên bi Kurdî, ji vir û weha de jî bêne kufşkirin û wenda nebin, min navên gundan yên bi Tirkî ne nivîsandiye.

**MÎRGEHA ÊZDÎYÊN LÎ HERÊMA HEKKARÎ Û SERHEDÊ**

**Warên Êzdiyên li Serhedê**

Li nav û derûdorê bajarê Wan, Tendûrek, Alazix, Qers, Îxdir, Muş, Bedlîsê, Bazîdê, Sarikamiş, Karakose, Axrî, Varto, Ardehan, Patnos û.w.d.

Lêkolînvan jî dibêjin: "Piraniya kurdên Soviyetê ji Tirkiyê; Beyazîd, Bitlîs, Mûş, Diyarbekir, Êrzûrûm, Qers, Îxdîr, Mardîn, Wanê û gundên dorberê wan hatine. (5:34-35)"

"Hejmara eşîrên Yezîdiyên li derûdora Beyazitê 1800 malên.(18:209)".

**Navên hinek eşîrên Êzdiyan ku li Serhedê diman ev in:**

Çavkanî didine xuyanê: "Dîroknivîsekî Kurd bi nav û deng Melle Mehmûdê Bayazêdî, di sedsala 19'êde, di derheqa Êzdiyan de weha dinivîse: "Jimara teyta Êzdiyan gelekî pir e;

a) Eşîrên wanî li wîlayeta Beyezîdê ev in: **Huseni, Şasakî**(Kaşaxî), **Çux Reşî, Kele Sorî û Desinî.**

b) Li wîlayetên Wanê û Mehmudî ev êlên Êzdiyan dijîn: **Barvî, Reşî, Şendakî, Başamî, Şanda Sorî, Kurtakî, Darkazinî, Botekî û Hurî.**

c) Li Muş û Bedlîsê ev tayifên Êzdiyan dijîn: **Çakoyî, Avokî, Akusînî û Bellî.** (6:20)"

**Li gorî zargotên me, eşîrên Êzdiyan yên ji mîrgeha Çolemêrgê heribîne nav Êrmenîstan û Gurcîstanê û hêjî hene ev in:**

"***Eşîran Hesenan***, Ev di salên 1820 -1830 de ji Eyntaba Serhedê fermalû bûne çûne nava Ermenîstanê; Gundê Şamrane. Îro hêja jî nêzîkî 300-350 malî lê dijîn. (6:16)"

***Sîpikî:*** "Dema Justin Parkins`tî di sala 1837 de ji Urmiyê diçe here Erzuromê, ew hingê li başûrê çiyayê Agriyê û li tevayiya derûdora çemê Firatê rastî eşîra Êzdiyên Sîpikî dibe.(9:141)"

"Eşîran Sîpikan, ev heta sala 1914'e jî li Întabê (Eyntabê) gundên weke: Xanik, Esmer, Melle Şemdîn, Tutek, Bedboriya û çend hebên dinê gundê Êzdiyan bûn. Dûre Sîpikî ji vir jî femaludibin têne Qersê. (6:7 û 6. tevayî."

"***Eşîran Bazifiya***, li Wanê li gundên:Şemsedîn, Qerkend, Dêcad, Unî û Êynzafê bûne. Eşîran Reşa li Beyazîdê, li Qeza Mahmudî hingê 2500 nefer bûne.(7)" Ev eşîran Şêxên Şêxûbekiriya ne.

***Qilka, Zuxirî,Torînî, Mendikî, Hewêrî, Şemsika, Dasinî, Cibran, Şerqî (Şêxên Şêxûbekirî), Mendorî, Reşî, Çaxreşî, Musêsanî, Rojkî, Xaniyan, Anqosî, Mahmûdiko, Mantacî, Memreşî, Gerdenzerî, Pîvazî, Belî, Beravî, Suhanî, Qoçî, Lokî, Selmîkî, Pirpirkî, Remoşî, Dawudî, Budî, Bikî, Mastekî û whd.***

Siltanên dewleta Osmanî, çiqas xwastine derheqa Êzdiyan de malûmeta nedin, lê dîsa jî mecbûr bûne. Dema ku wan lêkolîn û dokument li ser dîrok û çanda bajarê Wanê nivîsandine, mecbur bûne bahsa Êzdiyan bikin û wan kiryarên xwe veşêrin. Lewma jî ew timî "weke gurê xwe bixe eyarê pez" xwe dixine gelek şiklan û îro jî di çapemeniya xwe de bahsa netew, ol, cîh û warên me Êzdiyan dikin û weha dibêjin:

" Di dema berî sala 1591'ê de 18 eşîrên mezin li Wanê û derdora wanê hebûn, lê belê îro ne mumkun e ku meriv rastî navên wan hemuyan bê.

hinek çavkaniyan eşîrên li derdora wanê weha birêzkirine:

Mahmudiyan: Êzdiyê li derdora Hoşabê,

Dumbliyên Bohtî, Êzdiyên li deşta Sekmenê,

Mam Reşan, li Hoşabê,

Bazuki, li Ercîşê,

Bradost, Tirgeverê,

Rujikî, li her deverî,

Eşîra Şikan: Reşi, Baravî, Mendekî, Bele, Kurtî, (Ev Tev Êzîdi ne) , Şikak, Dakurî, Şevlî, Ademî, Şemsikî, Mukrî, Livî, Sî Çarikî.

Eşîra Ertuşî (Hertoşî): Weke Gevdan, Giravî, Zirkî,

Eşîra Dunblî (Zaza): Çarik, Hormik, Lolan-Haltî, Hatî,

Eşîra Haydaran, Spikî(Hatî), Cîbranî, Haseniyan (Halidî) (Çavk:8)"

Li gorî lêkolînên nivîskarê ereb ;" Ibn Fadlallah , Êzdiyên ji eşîra Mahmudiyan li herêma bajarê Wanê, li derûdora kela Xoşabê û di nava çiyayên rojhilata Gola Urmiyê diman.(9:87)"

**Navên hinek gundên Êzdiyan ku li derûdora Mîrgehan Hekkarî diman ev in:**

Çavkanî dibêjin: "Li Muşê qezeyek hebû, navê wê Kasur. Di vê Qezayê da sî û heşt gundê Êzdiya hebûn, gundê: Sîpanokê, Bîrkan, Melekan, Bagçe, Pizong, Sûsbêrd, Mizgeft, Qiştan, Pîrmelek, Neynûk, Arî, Çuxur û w.d. (10:279) "

***Dîsa birêne li Çavkanî: 11:***

| Navê Qezê | Navê Nehiyê | Navê Gund |
|---|---|---|
| Diadînê | | Tûtekê |
| Surmeliyê | Îdirê | Qerequê (130 Malbuye), Soybilaxê, Zorê |
| Qersê | | Qizigulê, Sûsizê û Digorê (Ev gundên Pîrên Ormexalan bune) |
| Wanê | | Ûtê, " Hemzoyê Bedo dibêje: Li der û dora Wanê nêzîkî donzde gundên Êzdiyên ku bi eşîran Cangir Axa, ku ji sala 1914 heta 1918 |
| li dijî | | leşkerê Romê şerkiriye, girêdayî bûn, hebûn |
| Bêrgîrê | | Pîşik |

**MÎRGEHA ÊZDIYÊN LÎ DERÛDORA MEREŞ Û MELETÊ**

**Warên Êzdiyên li derûdora Mereşê û Meletê**

"Berê Êzîdi di devera Kilîs, Heleb, Antakiya, Hims, Hema û Serêkanî uhwd. de hebûn û ev ji warên kevnarên Êzdiyan e .(12:21)"

**Rewşa Êzdiyên li derûdora Mereşê û Meletê**

" Fermanrewayên mezin ên Al-i Eyyûb, di destpêka sala 1005ê koçî(1597ê z) de, eleqeyek zêde didine Şêx Mend (ê Êzîdî k.t.) û wî dikine mîremîran ên hemû kurdên li Şam û Helebê. Nav û dengê Şêx Mend li nahiya Quseyrê ya nêzîkî wilayeta Antakya yê roj bi roj belav dibe. Bi vî awayî ji her milî ve kurdan berê xwe dan balê; ji bilî vê , kurdên li aliyê Cum(afrînê k.t) û Kilîsê rûdiniştin jî hatin û ketin bin siya parêzgeriya wî. …..(2:250)"

" Navên gundên Êzdiyan ku li derûdora Kilîsê ev in: Mehrevi, Burc-ul Qaz, Baskal, Kevkeb, Qatmî, Qastal, Arşuqikar, Abu Kaab, Kifrmazin, Kifr Yezîd. (17:272)

Li gorî ku dîroknas dibêjin, hinga Tirk ji Asiya navîn hatine, ewan hingê bi darê zorê gelek deverên ku Êzîdî bi serexwe tê de dijiyan xistine bin desthilatdariya xwe. "Tirkan di sala 1071 de herêma Meletê jî xistine bin bandora xwe(9:43)". Xuya ye ku hêja hingê gelek eşîrên kevneciyên vê herêmê ji cîhên xwe heribîne û bi deverên dinê ve çûne.

Li ser rewşa Êzdiyên li derûdora Mereşê û Meletê de gelek kesan nêrînên xwe ji hinek ciyan an jî ji hinek kitêban komkirine û nivîsandine. Ya rast ew e ku dîrok hêja jî eşkere ne hatiye vekirin.

Ez dikarim li ser rewşa îro bibêjim ku Êzîdi li vê

www.arsivakurdi.org

heremê ne mane. Lê, Êzîdi hêja li derûdora Şamê û Serêkaniyê hene.

"Kilîs: Beglerên Kilîsê ji Hekkarî û Amadiyê hatine. Quweta (Hukmê) van Began li derûdorên Kilîsê û Antiok (Antakya) hebû. Evan Êzdiyên li Kuzer, Hamma û Maraşê jî xistibûne bin îdara xwe . (7:31)"

Ew Êzdiyên, ku koçeberî welatên Qafqasiyan û ciyên dinê bûne, tenê yê Qafqasiyan karibûn Êzdiyatî û çanda xwe bi zahmetê giran biparezin.

Hemû Êzdiyên ku di nava sînorên Cumhuriyeta Tirkan de mabûn; Êzdiyên Xaltiyan, Amedê, Hekkarî-Serhedê, Botan (Basa), Çêlka (Tur-Abidin), Meletê û Ruhayê-Wêranşehîrê ev bi piranî hatine qirkirin, helandin û reviyane, hatine Ewrûpayê. Di waqas herêman de, îro çend malên Êzdiyan bi tenê li devera Xaltiyan û li herêma Wêranşehrê de mane. Belê eger mirov îro wan tevan bîne li ser hev, weke gundekî piçûk jî tûnene.

Em ji bîra nekin hemu netew û dewletên ku Kurdistan dagirkirine, naxwazin tucara meriv di Her weha ji ber wan neheqiyan e, tu kes nikare di derheqê hêjmara Êzdiyan de agahdariyeke rast bide. Tiştên hatî û tê gotin, tenê gumanên evdan e. Çendeyek berî vêga dewleta Tirk li gorî hilbijartinên xwe yên fermî hêjmara Êzdiyên li bakurê Kurdîstanê mabûn weha diyar dikir:

"Ji sala 1985 heta 2000 an, hêjmara neferên Êzdiyan ku di nava sînorên Tirkiyê de mayî weha ye: **Di sala 1985 de 22632 nefer, Di sala 2000 de 423 nefer (13: 6)"**

Vêca ez hêvîdar im ku hinek ji dîroknas û lêkolînerên dîrokê, karibin ji van agahdariyên min li jorê bahs kiriye fêdebikin û evê bibine alîkariyek ji wan re, ku karibin hê zaniyarên zêde li ser wan babetan kombikin û lêkolînên xwe eşkere bikin. Dîsa ezê gelekî dilxweş bim gava ku ewê ji vaqas bûyerên bûyî, wekî çawa V.O.Klyûçewskî gotiye:"Em gereke demên derbazbûyî fêr bibin, ne ji bo wê ku ew îdî derbaz bûne, lê herwaha bona wê, ku ew dema derbazbûyî nikaribûye paşmayînên xwe bide paqijkirinê.(14)" bikin.

Ez ji tekoşîna netewa rizgariya Kurdîstanê ya îro hêvîdar im ku, ewê ji vir û weha de, zêde ji mafên Êzdiyan re xwedî derkevin. (*9)"

Kemal Tolan, Xemxwar û Berhevkarê Kevneşopên Êzdiyatiyê

*** Çavkanî:**

**http://pukmedia.co/kurdi/gotar/157-derbar%C3%AA-ezdah%C3%AEt%C3%AE-y%C3%AA-de-l%C3%AAkon%C3%AEna-kemal-tolan**

Andrew Colins, Meleklerin küllerinden

**http://www.pen-kurd.org/kurdi/kemal-tolan/ezdiyati-haveyne-mirovatiya-mezopotamiya.html**

Süleyman Sabri Paşa, Van Tarihi ve Kürt Türkleri Hakkinda Incelemer, 1928,

**http://yeziden.de/44.0.html?&tx_ttnews[pointer]=106&tx_ttnews[tt_news]=208&tx_ttnews[backPid]=22&cHash=dbca0e3ee85d1a38b631b1c79e651f0a**

**http://www.gelawej.net/pdf/Saristaniya-ku-Ezdiyan-destpekirye-biparezin-2--Kemal-Tolan.pdf**

**http://www.rizgari.com/modules.php?name=News&file=article&sid=11512**

A- Pîr Xidir Suleyman, Êzdiyatî, 1996 Dihok. Rûp:21 û B-

http://www.ezidinasi.com/books/mahfil/1.pdf **rûpel :4**

9-Ev babeta û tevaya çavkaniyên babet di pirtûka Kemal Tolan, Hebûn û tûnebuna Êzdiyan tev romanên zindîn e. Mijdar 2000. Weşanên Mala Êzdiyan ya li Oldenburgê-Almaniya de hatine weşandin.

*Hoşeng Broka*
hoshengbroka@hotmail.com

KURT û KURMANCÎ



## *Wexta ku „şoreş" dibe „sola" Xwedê!*

Piştî 28 mehan ji vêketina „şoreşa" Sûryayê, ku bi bangeşiya „rûxandina" rejîmê, dest pê kir û diyare dê bi rûxandina Sûryayê û sûriyên wê, dawî jî lê were, pirsa ku li seranserî wêran, wêrankarî û wêrankarên Sûrya û Sûrya, di vê serdema sûrî de, tê kirinê, ev e:

Aya ev ya li Sûryayê li seranserî 28 mehên xwînwêran dibe, ku xwîn bi xwînê tê kuştinê; xwîn bi xwînê tê şuştinê; xwîn bi xwînê tê jiholêrakirinê û xwîn bi xwînê tê şermezarkirin, binpêkirin û hetikandinê, bi rastî „şoreş" e?

**Kurt û Kurmancî,**

„şoreş" li Sûryayê, bi ya min, ji mêj de, qediya ye.

Ji mêj de, ne Sûrya di „şoreşê" de maye, ne jî şoreş di Sûryayê de!

Ji mêj de, ne „şoreş" di bîra Sûryayê de maye, ne jî Sûrya di bîra „şoreşê" de!

Ji mêj de, ne aqil di „şoreşa Sûryayê" de maye, ne jî „şoreşa Sûryayê" di aqil de!

„Şoreşê" li Sûryayê, ji mêj de, aqilê xwe xwariye!

Ji wexta ku wê dilê mirovan xwar, wê pê re aqilê xwe jî xwar!

Ji wexta ku xelkên terorê bûn „xelkên şoreşê", û projeyê terora mezin bi serweriya „El-Qayda" û gurûpên wê yên çekdar li „Sûrya Şoreşê", bû projeyê îmaretên „sunistaneke mezin", ji wê terorê ve, „şoreşê" serê xwe, serê xelkên xwe û serê Sûryayê xwar.

Ya rast, ji wexta ku „şoreş" bû „soleke mezin" di lingên Xwedê de, ji wê „solê" ve, bi qasî ku Sûrya di „şoreşê" de qediya, hewqasî „şoreş" jî, di Sûryayê de qediya;

bi qasî ku Sûrya di „şoreşê" de rûxiya, hewqasî „şoreş" jî di Sûryayê de rûxiya;

bi qasî ku Sûrya ji „şoreşê" reviya, hewqasî „şoreş" jî ji Sûryayê reviya!

Ya rasttir, bi qasî rastiya xwîna Sûryayê, ku her diçe mezintir dibe, „şoreş" li Sûryayê, ne „şoreş" belkî antî-şoreş e; ne „şoreşa" Sûrya û Sûriyan belkî ya antî-Sûrya û antî-Sûriyan e; ne „şoreşa rûmet û azadiyê", belkî a antî-rûmet û antî-azadiyê ye!

Şoreş, îro roj, li Sûryayê êdî ne rastiyeke mezin, belkî dereweke mezin e!

Ne hêviyeke mezin, belkî xweziyeke mezin e!

Ne hezkirineke mezin, belkî kîn û nefretke mezin e!

Ne paşeroja jiyaneke mezin, belkî paşeroja mirin û kuştineke mezin e!

Ne bîra serkeftineke mezin, belkî bîra binkeftineke mezin e!

Ne berê azadiyeke mezin û rûmeteke mezin, belkî berê koletiyeke mezin û bêrûmetiyeke mezin e!

Ne aliyê silava destên mezin, belkî aliyê pihînên lingên mezin e!

Ne projeyê medeniyeteke mezin, belkî projeyê hovîtiyeke mezin e!

„Şoreş", ku îro „soleke" mezin e di lingên Xwedê û „allahûekberiyên" wî de, êdî ji projeyê dewleta mirovan li ser erdê bihtir, ew projeyê dewleta Xwedê li asmanan e!

Ew ji projeyê dewleta mirov bihtir, projeyê „dewleteke hov" e!

Hemî rê ji „şoreşa Sûryayê" diçin „sola" Xwedê!

Hemî rê ji „sola" Xwedê diçin xwîna Sûryayê!

www.arsivakurdi.org

# Arşevê Oskan bersiva Ezîz Xemcivîn dide

## Pênûs zimanê dil e, ziman jî hest û giyan e.







- Pênûs zimanê dil e û rûpel jî heşê min yê ku tim xwe jibîr dike, bibîr tîne..
- Helbestvan dûrbînek e, di tarîyê de dibîne..
- Mîna pizotek komir û di şûna xwe de dişewite û her diçe sortir û gûrtir dibe.
- Ez tiştekî ji helbestê naxwazim, ku ew dev ji min bigere….

- Divê zimanê hest û giyan, zimanê min be…

***1- Wek demsala buharê bi kenîna xaka rengîn, bi libên barana girs û xunaveke hûr re, li ber dengê bilbilê helbesta Arşevê Oskan hemû hêlînên guh şa dibin..***

***Min nexwest ko bi riya pirsên kilasîk derbasî jiyana Oskan bibim, lê min hez kir ko di çavên pênûsê de em çend gilî û rexne, jiyan û evîna ewê pênûsa welathez, pênûsa evînperwer guhdar bikin û li ser rûpelên dilbijîn û daxwaza çavên bendewar binivîsînin..***

***Birayê Arşev, Tu bi xêr û xweşî be, dixwazim bizanibim berbanga pênûsa te li deşt û çiyayên xaka bav û kalan bi çi rengî hilat..??***

Gelek caran nivîskarek tê û bi navê bav û kalên xwe , bi mal û diravên xwe, bi partî û saziya xwe, xwe hildide. Heger pênasîna nivîskarekî bi vî sincî be, naxwe çi cûdahî di navbera wî û mirovekî ji rêzê de ma? Giranî û taybetmendiya nivîskar , divê di pênûsa wî de bête ajdan û bişkivandin, ne di kesayetiya wî ya fîzîkî de. Niha ku Cegerxwîn, Xanî, Cezîrî, Feqeyê Teyaran ..... hwd, bi helbestên xwe nehatibûna naskirin, ma em ê tiyê kaniyên wan yên miçiqî bana? Tu bala xwe bidê, em bi sedê salan ji kaniyên pênûsên wan yên hestyar, hîna jî dilê xwe mîna baweşînên germiyanên welatê rojê hênik dikin. Hîna jî, li ber awazên bilbilên wan yên evîndar û mişext, tevna evîn û hêviyên xwe yên bê dûmahî, di bin nîrên tirsê de mezin dibin, dirêsin û li wan xweristên ku li sawîrên wan mikur tên û di hestên wan de hatibûn çandin… Li têla jiyana xwe didin û seyraneke bê demçax û dîwar dikin. Ku ne ev pênûs bana, yan perîkên ku giyan li asoyan difirandin, mirov dê çawa hest û nestên xwe bi tayê evînê dar ve kirana? Lewra ez pênasîna helbesvan, çîroknivîs, romannivîs û şêwekarekî di berhemên wî de dinasim û ev ji bo min naskirineke şareza ye.

***2- Helbestvan, nivîskar kî ye û divê kî be?.***

Helbestvan dûrbînek e , di tarîyê de dibîne. Ji herkesî bêhtir bi êşa bûyeran re dijî û gelek caran jî , berî pêkhatina bûyereke dîrokî dikeve taya şewitandinê. Digirî, ji hinavê xwe diqîre, dêşe, dişewite, lê bi hêsanî kes di wî de nagihê, bê çi dixwaze. Kes wî agirê, ku ew tê de dibirije nabîne, ji bilî wî.

Lewra kes beşdariyê pê re nake û ev dibe sedema afirandina berhemekê.

Di hundirê helbestvan de, şoreşeke har heye, li warekî din, warekî nîgarkêş û romantîk dijî. Dijwariya ku wî pir dêşîne, ku ji wan sawîrên xwe derdikeve û dîsa berê xwe dide vê jîwarî û riyalîteya jiyanê. Li nakokî û tevliheviya giyanî hişyar dibe . Carna dixwaze her tişt di çend kêlîkan de bê guhertin, lê bi ya wî nabe. Ku tiştek ji wan hêvî û xwestekan pêk nayê, dibe mîna pizotek komir û di şûna xwe de dişewite û her diçe sortir û gûrtir dibe. Lê tihna wî bi salan serma zivistanên bidestiyê dişkîne .

***3- Ji kovarên pel peritî, dema qedexekirina her peyvê, dema sînor û dîwarên zindanên mezin û dema tor û bendên ko piraniya pênûsan dibin sansor û çavneriyê de.. Ta dema niha, serdema internet û stelayet..***

***Bi kurtî nerîna te li pêvajoya helbesta kurdî bi giştî û li başûrê rojavayê Kurdistanê bi taybetî..??***

Gelek ji me naxwazin li gelek êşan mikur bên, bi behaneya ku ew kesên tu li wan rexne bigire, dê nema bi salan silavê li te bike. Lê ku min pesnê wî da, û wî jî dizanî ku ez li deşteke beyar sorgulên wî dijmêrim û li ber çemekî miçiqî ji wî re nêçîra masiyan dikim, wê nerîna wî ya hidurîn ji min re çi be?

Ev pirseke hundirîn e, ev pirs dikare perdê ji ser gelek sosret û gunhkariyan hilîne. Li çend rûpelan tu dinerî ku yek hatiye û dostekî xwe temîn kiriye ku li ser helbestên wî pesn û navtêdanan dide, heger ku ne xwedanê wan helbestên, ku tenê bi nav helbest in, ji xwe re nivîsandibe û li ser navê dostekî xwe tapo kiribe- bi rastî jî, ev şêwe êdî ji kesên rewşenbîr ve hatiye eşkerekirin. Ev kesana kê dixapînin ? Heger ne xwe , ji sedî sed, ne em in jî. Em dikarin şaxên afirandina wan bejnên hacûcî û bêmirûz, bi hêsanî bipîvin. Mixabin, yên ku di nav xirecireke erzan de, derdikevin pêş , îro bejna helbesta me bi wan tête pîvandin. Bê guman pênûsên ku rêza xwe û zimanê berhema xwe dizanin jî, hene, lê kêm in. Her tişt dikeve war û bazara erzan .

Helbest û wêjeya lawaz jî, dikare di vî warî de xwedan rol be. Ji sûdemendiyê bêhtir ziyanê dighînin çand û wêjeya gelê xwe . Berhema wêjeyî ya bilind, bêyî ku xwedanê wê propagandayê jê re bike, xwe dide pîvan û xwendevan bi pereyan lê digerin û pir caran jî peyda nakin . Lê ya lawaz û bêkêr, bi lavlavan li xwendevanan digere û bi ser wan de kelogirî dibe da ku ew berhem bête xwendin. Ji bilî ku wan berheman di dehên malperan de diweşînin, lê di dawî de kesê ku dixwînin jî, polîpoşman li xwe vedigerin û ev bi serê xwe, di baweriya min de malkambaxî û têkçûne.

Di nav vê xirocirê de, di vê govenda ku niha di malper, paltok, televizyon û radioyên me Kurdan de lidare, "bi piranî" şabaşên lawaz û erzan in .

Nemûneya Selîm Berekat, Cegerxwîn, Cezîrî, Celadet.. ji bilî nemûneyên nivîskarên cîhanî ... hwd. Li ber çavan e, ne rojekê pesnê xwe dane û ne jî şabaşên erzan bi daholan lidarxistine, lê bi hêsanî û di derîkî fireh re derbasî dîrokeke balkêş bûne.

***4- Ev bûye demek tu dikarî bibêjî ji sê çar salan û bi vir de gelek pênûsên nû serê xwe li cîhana belavkirina hêsan didin.. Geh bi helbest û geh bi gotar û geh bi konevaniyê (siyaset).. ??***

Di pêvajoya gelekî wek gelê kurd de, ku hijmara xwe di ser 40 milyon mirov re heye û heta niha bê welat û serxwebûn dijîn. Tiştekî xwezayî ye ku nifşên nih serê xwe hildin û bi nifşên berî xwe re têkevin rik û kêferatê.

Bi razîbûna nifşên kevn be yan bê reza wan be, wê derkevin û li zengilê deriyê nûdemekê bidin û derbasbin qunaxeke nuhtir. Ev ji aliyê afirandinê ve, lê bila em jibîr nekin, wek hemî miletan, wê yên bikêrhatî biserkevin û yên bêkêr xatir bixwazin .

Bila neyê jibîrkirin ku nivîsandin erk û berpirsyariyeke netewî û dîrokî ye, bi wî erkî çand û ramana civatekê têde tê parastin . Pêwîst nake ez hinek navan rêz bikim... ev di naveroka xwe de tiştekî gelemperî ye.

www.arsivakurdi.org

**5- Nivîsandina bi zimanê biyanî û taybetî (Erebî, Tirkî û Farisî) hinek ji nivîskarên me bi evan zimanan dinivîsandin û niha dest bi nivîsîna kurdî kirine..lê ew jî bi zimanekî şikestî, bê ko xwe fêrî ziman û tîpan bikin..??**

Min û çend hevalan di gelek nivîsên xwe de, ziman wek stûna netewê, alava ragihandinê, giyanê mirovan.... bi nav kiriye, lê ev binavkirin tenê di gewriya pênûsên me de û li ser rûpelan ma. Bi zimanê me gelek berhem hatine çapkirin . Pirtûkxaneya kurdî êdî dikare bibêje ez jî di nav zimanên dunyayê de heme . Li vir ez dixwazim bibêjim bi saya kê ev çand divê bê parastin, ku ne kurd bi xwe bin?

Hingî ku gotin tên dûbarekirin, mirov têdighê ku em dijî zimanên din radiwestin, na ne wisa ye. Dema ku zimanê bingehîn li cem min zimanê dayika min be, wê çaxê ez dikarim bê tirs, bi zimanên din jî binivîsim, bêyî ku ez bibim metirsî ji bo wendakirina zimanê xwe û bi taybet dema ku zimanê min ji hêla van gelên zordest bi tevdîr tê pişaftin. Wê çaxê ez jî ji wan re dibim alîkarê kuştina zimanê xwe. Divê zimanê hest û giyan, zimanê min be, û di baweriya min de ev tiştekî gelekî giring e. Wê demê wê zimanên din ji aliyê min ve bibin zinanên wergerandî.

Ew gotinên ku dibêjin zimanê kurdî têra nivîsandina berheman nake, ew ne rast e. Bila bêjeyên biyanî tê de hebin, wê çaxê xem nake hemû ziman bêjeyên biyanî kêm, zêde, di nav xwe de hildigrin. Vaye rewş li ber çava ye, bi sedan pirtûkên kurdî hatine nivîsandin, çi roman, helbest, lêkolîn, çîrok û ji nifşên nû re bûne saman, ji bo pirtûkxaneya kurdî. Heger kêmasî di vî warî de hebe jî, ne kêmasiya ziman e, lê belê kêmasiya nivîskarên kurd, yên ku bi zimanê biyaniyan dinivîsinin û zimanê xwe paşguh kirine.

**6- Hindek ji nivîskarên me yên li ewropa berê xwe dane wergera berhemên cor bi cor yên nivîskarên biyanî, lê li gor hat xuyakirin kesin ji wan hene tenê ji bo nav û dengiyê ye ango wergerek ne serketî dikin, û hem jî hinek ji van nivîskaran wêne û ramanên helbestî ji toreya ewropî dikişînin û dikin nav pencên helbestên xwe, nerîna te li ser vê mijarê û evan kesana çî ye??**

Carekê hevalekî digot: Ta ku ez helbestekê dinivîsim, divê bi dehê pirtûkan bixwînim.. Ez jî dibêjim çima ? Ma helbest ne peyameke hestyare û hişmendî ye ? Ew nikare di her gavê de were. Gelek caran helbestek tê hişê min û ku ez wê di wan kêlîkan de nenivîsim, nema dikarim di demek din de, wan xeyal û xeman dîsa li hestê xwe vegerînim. Ango heta mirov deh helbestan binivîse divê sed pirtûkî bêne xwendin ? Ma xwendina pirtûkan tenê di dema ku helbestek bê nivîsandin, yan divê ez rojane pirtûkan bixwînim? Yan jî her yekî pirtûk xwend dikare helbestan binivîse ? Di baweriya min de ev tiştekî ne rast e!

Ji bo perçeyê diwem ji pirsa te, ez dixwazim bibêjim dizê her tiştî hene, lewra dizê wêne û wêjeyan jî dê hebin. Lê ziyana mezin ew e, ku divê mirov helbestên wî zimanê Europî bizanibin û hemû pirtûkên wan xwendibin, heta ku nas bikin bê vî kesî ji kû dizî ye!? Ev jî bi rastî li ser bext û piransîpên wî nivîskarî dimîne . Naskirina wan diziyan, encax di ruhê mirov de bêne zanîn, ku ev wêne ne herikandina kurdî ye û ne jî rihê kurdî di xwe de hildigre, heta radeyekê di baweriya min dikare bête naskirin.

**7- Çawa ko derya her leymişt û gemarê, her tiştî ji hinavê xwe davêje peravê, wisan deryaya internetê tiştek lê nayê veşartin.. di demeke kurt de bi sedan nivîskarê internet çêbûn û kesên xwedî wêneyên balkêş li rûpelên malperan berz bûn.. mîna xakek bi dehê salan baran nedîtibe û ji nişka ve payizxêrk bi ser de bibare.. êdî wê çi li wê axê şîn bê û çi şîn neyê, çimkî tovê her tiştî bi ba û bahozan re lê bariyaye.. Em ê çawa ewê xakê tenê ji gul û nêrgizan re biparêzin ??**

Vê pirsa te tiştek anî bîra min, li Europa firotina xwarina lezgîn ya ku ji rêwiyê li ser ligan re ye, jê re dibêjin (donner), ew xwarin hem bi cor û kalîteya xwe çirûk e û hem jî erzan e. Lê xwarinên ku bi bêhna fireh li xwarngehan ji mêvanan re tên amadekirin, hem çêja wan xweş in hem jî buha ne... li nivîsên me yên elektronîk jî wisa hatiye. Di nav vê xirocira enternêtê de, gelek nivîs û nivîskar diyar dibin, hinek ji wan mirovan cara pêşî navê wan dibihîzim û di çend rojan de navdar dibin bêyî ku tu bizanibe ji kû derketin û kî ne û kî ji wan re dinivîsin.

Gihaye wê asta ku hinek jin yan kur bin tenê ji bo wêneyekî xwe daxîne bûne nivîskar. Ji bo ku şaş neyê ragihandin, ne ku hemû nivîsên malperan wisa ne û ne hemû malper jî wan nivîsên erzan diweşînin. Lê mixabin piranî wisa ne. Gelek malper hene çi ji wan re tê bêyî ku lê vegere wê lîsteyê bi hev re dadixin malperan. Ez bawer im ev kar tevliheviyeke mezin bi xwe re tîne holê û hişê xwendevan jî bi xwe re tevlihev dike. Ya ji vê kambaxtir ku ji aliyê rastnivîsînê ve jî nayê rastkirin hem xwedanê piraniya malperan nizanin bi kurdî bixwînin û hem xwediyê wan têkestan jî bi kurdî nizane binivîse. Gramêra vî zimanê kurdî yê birîndar jî bi xwe re serobinî hev dikin .

**8- Birayê Arşev tu û helbestê çi ji hev dixwazin, helbest ji Arşev re çî ye, "pênûs û pertûk û defter"..??**

Pirsek kurt û watedar e, carna tê ku pişta ramana min di bin van pirsan de xûz bibe. Ez nikarim bi hêsanî û bi bersiveke rasteqînî ji van pirsan derkevim, ev pirs barê min giran dikin. Lê em hemû di pêvjoya bersivdana vê pirsê de, di nav gereke bê dawî de ne. Ku em hatin û me naskir çima em dinivîsin, bawer nakim ku wateyek ji nivîsandina me re bimîne. Çendî ku em di jiyana xwe ya nivîsandinê de , li vê pirsê bigerin ewqas jî, nivîsandina me dewlemed dibe. Wê çaxê em ê li xwe bigerin û bi gerîna me re , gelek pirsên din derdikevin û yek yekê ber bi rastiyê ve dajo. Ez dikarim wisa bersivê bidim "ez li xwe digerim , ku min xwe dît, pêwist nake ku helbestê binivîsim".

Pênûs zimanê dil e û rûpel jî hişê min î ku tim xwe jibîr dike. Gelek caran pênûs dibe şûr û rûpel jê re dibe meydana şer . Bi hevûdu re cengekê temam dikin û dîrokekê dinivîsin, lê kîjan dîrok ? Çîrokekê di bin lingên hespan de dinexişînin û bi şihîna hespan re bang dikin, lê li kê? Ev babîsoka ku niha ez di nav de me, ji bo min dîmenekî rewrewkî ye, lê ji bo xwendevan û temaşevanekî dibe ku tabloyeke balkêş be.

Ez tiştekî ji helbestê naxwazim, ku ew dev ji min bigere, ez dev jê digerim, lê her gav bi min re dijî, heta bi xewnan jî li min dike dojgeh û min di nav sawîran de rast û çep vedigevizîne û bi kû de diçim li pey min e.

**9- Carcaran (nivîskarin) hene xwe li helbestê dikin bela, di ragihandinê de navê nivîskar û (helbestvan) li wan bûye, hinan ji wan xelat jî wergirtine, pirsek li vir min dêşîne gelo ev sazî û kesên ko xelat dane wan wisan li vê pileyê nezanin; an berhemên evan(helbestvanan ) nexwendine lê li ser nav û dengiya vala mîna dengê daholê ew nirxandine??**

Evê mîrata bindestiyê her tiştên me tevlihev kiriye, kesayetine nîvco , saziyîne qop, dîrokek ku alîyekî wê pûç ...... hwd.

Di wî aliyê pûç de, ew kesayetên keysebaz, keysê pêk tînin û li cihê gelek lehengan rûdinên. Di wî aliyê gewde de, sazîne ava dibin û bi navê giyanê kurdayetiyê dîwarên xwaromaro li sînga dîrokê ava dikin. Di wê keşwera dizan de, tenê cihê keysebazan, seqetan, bazervanên giyan û hiş, dizên xewnên avis heye.... lê ev rewş bi me re mezin bûye û dibe mîna kabûsekî bêdil bûye.

Tê bibêjî , wê her bimîne û di encama dîrokeke tarî de, bi ser ke ve? Ez ê bibêjim na ! Tê bibêjî kengî ? Ez ê bibêjim heta ku mirovatiya me li wargehê xwe yê rasteqînî tovên jiyaneke azad biçîne . Bindestî mêvanekî bi hemû aliyên xwe kirêt e . Ne tenê dijmin jiyana me tevlihev kiriye, lê em bi xwe jî carna dibin alavên tevliheviyeke malwêran . Tîpên nivîsa çîroka me ji hev belawela bûne û zor e, ku em rastiya dîroka xwe bi wan tîpan bixwînin , lê heta kengî? Em her roj vê pirsê ji xwe dikin û hîna bersiv di gewriya berbangê de asê bûye . Ku hat û roj li me hilat wê her yek li rêka kadizan mikur bên .

08/02/2008

***Têbînî:*** *Me rojnama Pênûsa Nû soz dabû xwendevanên xwe ku emê zû nivîskarê xwe yê nemir Arşevê Oskan ji bîra nekin , ji bo vê jimarê em hevpeyivîna ku di sala 2008an de rêzdar Ezîz Xemcivîn pêre kiribû, ji we xwendevanên hêja re diweşînin.*

www.arsivakurdi.org

Amadekirin: *Ezîz Xemcivîn*

# Bingehên gramera kurdmancî xeleka 2an

## "Celadet Alî Bedirxan"



### Bi navê Yezdanê pak ê dilovan ê mihrevan

### Rêmanên berpêşkî

12- Tîpa dubare: Di zimanê kurdmancî de tîpa dubare nîne. Ji lewre, heke di bêjeyekê de tîpek dubare bû, yeke wan ji ber xwe de dikeve û tîpek bi tenê dimîne. Wekî niho, parkîta {tir} gava dikeve paşiya bêjeyên ko bi {t}yê temam dibin yek ji wan her du "t"yan dikeve. Ji lewre di nivîsandinê de jî {t} yek bi tenê tête nivîsandin. Ji ber ko di vekîta kurdmancî de tîpa ko naye xwendin, naye nivîsandin.

Ev in çend misal:

xurt xurt-tir xurtir

rast rast-tir rastir

kurt kurt-tir kurtir

Çend misalên din :

paş-şîv paşîv

baş-şev başev

yek-kîte yekîte

Tîpên têvel, lê ji yek cihderkê, an ji cihderkên nîzingî hev jî nadin pey hev:

rind-tir rintir

pişt-dawî pişdawî

bilind-tir bilintir

dewlemend-tir dewlementir

Şanek: Digel vê hindê û ji ber hin bêgaviyên vekîtê, hin tîp{nemaze di daçekan de} herçend neyin jî bi lêv kirin, têne nivîsandin. Ew nayine bi lêv kirin, ji ber ko bi awakî tîpeke dubare ditînin pê. Lê ew ne bi hev ve ne, ji hev cida, û yeke wê di dawiya bêjekê de û a din di destpêka bêjeke din de ye.

Ez di gund de bûm {gun'de}

Dengbêj jî hene {dengbê'jî}

Serheng gî hatin {serhen'gî}

Ji gayê gewir re {gew're}

Ez ji kû zanim {e'ji}

13- Kît: Bi vebûn û hatingirtina devê me dengek tête pê. Ji tevayiya wî dengî re kît dibêjin. Kît ji yek an ji yekê bêtir tîpan hevedidanî ne. Di kîtên zimanê kurdmancî de bi gelemperî ji yekê heta pêncan tîp peyda dibin.

1- a ê û……

2- no an ez ma pê…..

3- dev erd pêr sto kar….

4- qenc dran deng pişt…

5- Stran stand……

14- kîtên bêjeyî: Herwekî di kîtan de, ji yekê heta pêncan tîp peyda dibin, bêje jî an ji kîtekê an ji çend kîtan bihevketî ne. bêjeya ko ji kîtekê hatiye pê jê re yekîte, û bêjeya ko ji çend kîtan hevedidanî ye jê re pirkîte dibêjin.

Bêjeyên yekîte: dar, dran, got, stran, xwar, deng, têr, no.

Bêjeyên pirkîte: serşok dengbêj, mêvandar, hilfirandin, dixwîne, qermiçandin, balafirgeh, rojnamevan.

Not : Bêjeyên pirkîte li gora hejmara kîtên xwe binav dibin: Yekîte, dukîte, sêkîte, çarkîte, pênckîte…..

15- Bêje: Tiştê ko tête bîrê û di dil de radibe fikirek e. Ev fikir carina şikilekî û carina manakê ditîne pê. Ev her du awayên fikirê bi bêjeyan têne eşkere kirin. Bi gotinên din her bêje nimînendeyê fikirekê ye.

Wek: dereng, hesp, reş, wan, hatin, jê-re, digel, ez, hevraz, berwar, mehder, lo, zû, dixwar, nêr, belek, çavreş, tîj, dilovan.

16- Birên qisetê: Bêje li gora mana û dehkerên xwe ji hev bi ferq in. Birekî wan mirov, heywan,û tebayine nerihber yên ko bi dest têne girtin an dikevin ber bînahiya me şanî me didin. Birekî din tiştine welê pêş me dikin ko bi dest nayine girtin lê di bîr û di ber çavên me de radibin.

Ji aliyê din bêjeyine welê hene ko bi serê xwe nikarin tu tiştî raver bikin., lê gava bi bêjeyên din ve dibin û dikevin navbera wan mana wan diedilînin, dibin serî û wan bi hev re girêdidin.

Ji lewra di her zimanî de bêje li gora maneyên xwe û cihê ko di qisetê de dibin û wezîfa ko li ser xwe digirin bi çend biran leva dibin. Ji wan re birên qisetê an texlîtên bêjeyan têne gotin.

Di zimanê kurdmancî de birên qisetê deh in: navdêr, veqetandek, rengdêr, pronav, lêker, jimarnav, hoker, daçek, gihanek, baneşan.

17- Guhêrbarî: Birên qisetê ji awirê guhêrbariyê ve bi du biran leva dibin: guhêrbar û neguhêrbar …ji birên qisetê pênc guhêrbar û pêncên din neguhêrbar in.

18- Bêjeyên guhêrbar: Bêjeyên guhêrbar ew in ko di qisetê de şikilên xwe ên eslî diguhêrînin, têne tewandin û dikevin şikiline din.

-1-Navdêr: Cemşîd, Sînemxan, kaxez, kerî, şîpane, piling, Herekol, can, qencî, spîtahî, selef, mehder, xurdebîn…..

-2-Veqetandek: ê , a, ên, ek, in…..

-3-Pronav: ez, we, ew, yên min, evê ha, çi, kî, kê, ko, kîjan….

-4-Jimarnav: yek, dused, heştek, nîvyek, çareçar, yeko yeko, pênc bi pênc…

-5-Lêker: were, dixwar, dê bihata, keti bû, divêt, nivîsandin, xwendi bûn, daket, çikandin….

19- Bêjeyên neguhêrbar: Bêjeyên neguhêrbar ew in ko di qisetê de şikilên xwe ên eslî tucaran naguhêrînin û hergav weke xwe dimînin.

-1- Rengdêr: Gewr, nû, qenc, bilintir, helesor, mezin, spehî, nizim……

-2- Hoker: Holê, îro, hingê, nik, bes, kêm, kû, kengê, niho, no, belê…..

-3- Daçek: Di, li, ji, di-de, ji-re, der, digel, berî, paşî, piştî….

-4- Gihanek: Wek, û, an, lê, ko…

-5- Baneşan: Lê, lo, ax, hey, way, ho, ox….

20- Vekît: vekît tevayiya isûl û qeydeyên nivîsandin û bihevebûna bêjeyan e. Bi gotinên din her bêje vekîta wê, yanî şikilekî nivîsandina wê î xweser heye. Bi tenê bêjeyên ko bi çend awan têne bilêvkirin bi çend awan jî têne nivîsandin. Herwekî:

"Bihurîn , borîn. Rih, rî. Reh, ra. Nêzing , nîzik. Şehristan , Şaristan. Teva , teba. Bihin , bîn. Birçî , birsî . Nimêj, nivêj ."

Ji milê din vekît ji me re bêjeyên ko biheve dibin û yên ko biheve nabin ji hev vedigerîne û awayê bihevebûna wan şanî me dide.

Qeydeyên vekîtê ji tevayiya gramêrê dertên .

Di bihevebûna bêjeyan de qeyda gelemper ew e ko her bêje bi serê xwe tête nivîsandin û bi bêjeyine din ve nabin; ji hin awartan pê ve.

Wekî niho, di komeka "ez dihî li nêçîrê bûm " de , tu bêje bi yeke dî ve ne bûye, ji ber ko her yeke wan ji birên qisetê texlîteke din e.

"Ez : pronav, dihî : hoker, li : daçek, nêçîr : navdêr, bûm: lêker."

{ê} ya ko bi " nêçîrê " ve bûye tewang e; û tewang hergav bi navdêr û pronavî ve dibin.

**Têbînî:** *Me soz dabû ku emê li ser xelekan, bingehên gramera kurdmancî ya Mîr Celadet Bedirxan biweşînin . Amadekirina kekê me yê hêja Ezîz Xemcivîn e, di vê jimarê de em xeleka duyemîn ji we xwendevanên hêja re diweşînin (Rojname ).*

www.arsivakurdi.org

# Ciwantirîn tişt zilam bike bo çûna buhuştê

## Helbest: Rêbiwar Sîweylî*



Werger ji kurmanciya xwarê: ***Dilşa Yûsûf***

Ciwantirîn tişt zilam bike
raxistina cila ye
cilê jinê
dema tu dadiweşîne
laş bi bîra te dikeve.
Wek roja ku sibehekê
dawiya şeveke nêr tîne
tarîkî û tirsê.
Her wê dema tu wan digvêşe
ta dilopa dawê ji avê
tînbûna te dişkê.
wek vegera ji rêwîtiya biyabanan
himbêzkirina navtenga yar
dema li ber dergah
dilop..dilop
çavriya te dike.
Piştî givaştinê
careke dî wan dadiweşînî
ta qermîçokên wan vebin
wek zelalbûna rû
dema ku guh lê dibe,
û dilê wî xweş dike...
Nigên te bixum, jin ê
gorên te wiqas bînxweşin,
ji misk û enberê pîroztir..
Bi bihna derpiyê xwe
cîhanê tijî bike ji gulavê,
belko hindekî
ev reşebayên tund û tîjiyê
bikevin..
Ez mirim ji ber girêkên temen,
min nizanî vekirina girêkên te
asantirin ji vekirina qelaya..
dema vedibin,
asan
bê xencer..
çi kef xweştir nîne
ji xwêdana bin çengên te
ji bihna xweş ya milên te
û teriya lepê destên te
ku dîrokek rijiya ye nav dîrokê,
û tu kesî ne nivîsiye...
Muyê zilamên pîroz
li mûzexana ciwane,
muyê te
bi dev û lêva ve...
Tiştek ji wê xweştir nîne
Nerm.. nerm
Perçe.. perçe,
wan ji satilê derbînî
cilên wê
û ristek li nik te
şan bidî ber ew hemî ciwaniya,
ristek e fêlbaz
dirêj ...dirêj
teng ... teng
jidiyayî ... jidiyayî
wek sihirbazekî di nava dîrokê de
helke ... helek,
dûriyan bi hev didrû
tenê ji bo ku
li ser raxîne
sûtyan
û kiras
û gore
û derpiyên wê...
Qet ji wê xweştir nîne
cilên wê raxî
berî mirinê
bihin bikî
hilmijî
serdan bikî.
nigên wê yên nerm
her wê dema
pêlavên wê datînî
û wan maç dikî,
pêş ku biçî buhuştê..
Ciwantirîn tişt zilam bike
bo pakbûn ê,
bihinkirina jin ê ye bi rûtî..
bo çûna buhuşt ê,
givaştin û firkandina dilê wê,
bi gotinên nazik
û peyvên pak,
da tu vekî dergehên giyanê wê
bo razîbûna Xuda,
cilên wê raxîne
li ser ristekê
ziravtir ji pira Sîratê
bo derbasbûna wî berî
bo çûna Buhuştê.

*Rêbiwar Sîweylî, sala 1969 li devera Suleymanî ji dayik bûye. Xwendina seretayî û navendî li Suleymanî bi dawîkiriye.li Peymangeha Hunerên Ciwan xwendiye, belê di gel malbata xwe koçî derveyî welat bûye, li welatê Danîmark jiyaye û nasnama wî welatî hilgirtiye . Li Danîmark ê xwendina xwe berdewam kiriye, û bawernameya Bekaloryos di sala (1996), û ya Master di sala ( 2000) wergirtiye, di biwarê felsefê de li zankoya Roskilde, û di heman salê de vegereya welat û li zankoya Selahedîn wek cîgirê mamûsta hate damezirandin. Di sala 2005 de bû mamûsta, û di sala 2007 de beşê Felesefê vekir, û di sala 2012 de bû cîgirê pirofîsor. Niha mamûstayê waneyên felsefa Kilasîk e. bi zimanên Kurdî û farisî û Erebî û Inglîzî berhemên xwe nivîsiye, û xwedî ( 26) pirtokên çapkiriye, di biwarên felsefe û rexnê de.

www.arsivakurdi.org

Pênûsa Min îro

Serhan Isa
serhanisa@hotmail.com



# Ji ABC ya şête helbestvanekî

-E-
dema li çavên qîzekê dinerim,
û ew yekser awira xwe ji min diguhere,
wê çaxê bi du Firîşteyên re
dikevim girewa giyansipartinê.
-V-
Piştî min naskir, ku evîna te,
mîna sîbera Sipîndarê ye;
Min soz da,
ku çarmêrkiya xwe,
dibin sîbera tu daran de nevedim.
-I-
Dema cî û dem,
di banahiyê hiş û sawîran de,
bûne xewin û leylan
min zanî ku ez bûme koçerek,
di bejna te de ey biyanistan.
-N-
Dema şev dibare,
û tene-tene,
xwe bi ser qurteronahiya dawî de dihejîne,
û bîna te ji nav reşkeziyên wêna difûre,
wê çaxê ez dizanim,
ku tu dibe nêçîra destekî din.
-i-
Dema di pîsîra demê de,
li navê xwe û te geriyam,
ez rastî, du ewrên nebariyayî hatim.
-S-
Her şev,
dema ku me rêçik,
şivîl,
best û newal,
li şûn xwe dihêlan,
min weha jê dipirsî:
Hîna xwîn di hinarkên te de diherike?
hîna lingên te dikarin te hilgirin?
hîna gavên te bi pêjna evînê hest dibin?
Weha digot:
Erê, erê eger têlek bi tenê,
ji perdeya dilê min biteqe,
dê gerdûnê tevî bide ber lehiya evînê,
dêmên min,
bi tîn û bîna evînê vepingizîne,
ji şûn gavêd min,
çêregeh dipişkuvin,
evîndar li terahî û keskahiya wana diçêrin,
wisa bi ser qurta dawî a şevê de radiwestiya,
û di guhên min de dikire pinge-ping.
-T-
Îro...
dema welatek li ser darûbestan kirin,
û ber bi goristana li pêxê gund birin,
wê çaxê min zanî,
ku stêra li rojavayî dil weşiya.
-A-
Hembêzên qeşa girtî,
dema li şevê diêwirin
dibine du gemyan.
-N-
di bînvedana dawî de,
qîzeke ji rêketî,
êrîşî xewletgeha min kir,
lêvêd min yên aware,
yên mîna kevanjenekî Kurdî,
li ser bejna xwe,
a mîna Gîtareke Espanî çêrandin.

www.arsivakurdi.org

*Boniye Cegerxwin*



## Amûda delal

Amûda delal
Ma ne bese
ji te re
Amûda delal
Ev xem û şîn

Bi salaye birîndarî
Dil bi êşî ,her dikî
qêrîn

Birîna te gelekî
Kûre , jê re
Her divê
Derman

Bi sala tu dinalî
bo zarokên, tev
nûpişkuvîn
ku bihevre li
sînemayê,windabûn
û şewitîn

Vaye dîsa
Tu dinalî
Gel dayikên
Xwey qehreman
Bo pêşeroja
kurda û bo
ciwanên me
yên bengîn
Dijware ev nalîna

Te, agir berda ye
dilê me
Ronî l´çava
Nema ye , hate pişaftin
dilê xemgîn

Çi bêjim ez,vaye
Cegerxwînê te
Îro, ne li vire
Da pênûsa wî
bibêjî û dil
pêre her bikî
Qêrîn

Lê xweş zanibe
Delalê, gelê
Kurd her
bi te re ye
û dîroka Kurdistanê
Wê, te hembêz bikî
Bi evîn
Bi rengê xwe,bi dengê
Xwe , te navê xwe
Daye nîşan

Li cîhanê bi tevahî
Ey tekoşera
tim bi vîn

*Alan pîr Mem*



## Axoş ji te

Dewletxwahe ev dil
rewan jê pirsî
te di çi de dîtiye xweşî??......

kêf û sema û şadî
ji zindanên kul û kovanan
tu dere bibe azadî
çiye ji nerîna te
ey dil.....ew xweşî
belê ey redûn
ji êşan min da xunav ji xûn
ewe evîna keç.......

keçîndareke axoş dike
bi mihir û mehrîbana xwe rojgar
ewe evîna keç.......

xwedya pêjna lewend
di evîna wê de bûme oldar û ferzend
sofiyê du çavên reşbelek
du lêvên regezperest
her maç û ramûs li wan na yê
ne ji her leb û dev
sofiyê dêm makdera avzêm
maç li ser dikin alan
û bi êş û jana re tên dîlan û govend
sofiyê hingilê te
pifnikê te......

du destên di rengê riwê sibê
sofiyê keça şêlaz
herdem ji tere nimêj û sselat

www.arsivakurdi.org

*BÊWAR BARÎ TEYFÛRÎ*



## Jîyan ..mirin

## Dîsa hovîtî

**Jîyan ..mirin**

Jîyan heye mirine
Mirin heye jîyane

QEHREMANÎYA ZÎLANÊ

Bûye heyîn
Îrade cesaret
Raman veger û bawerî

Ji bo KURDISTANÊ.

Tunebûna Zîlanê
Bûye nîfret
Dijî kapîtalîzm û împêrîalîzmê.
Mirina Zîlanê
Bûye vejîna jîyanê

Li KURDISTAN Ê.

Teqendina Zîlan ê
Bûye dîrok ya namûs ê
Li cîhan ê.
Şehadetîya ZÎLAN Ê

SERXWEBÛN Û PÊŞEROJE

Ji bo gelê niştiman ê.
Zîlan keça kurd
Bûye debistan ya rizgarîyê
Keç û xortên kurdan sond dixwin
Bi navê wê.
Navê Zîlan ê

Hebûna K U R D I S T A N Ê.

Tirba Zîlanê tiverik û zîyarete
Ji bo netewa KURDISTANÊ.
MIRINA ZÎLANÊ JÎYANA
KURD Û KURDISTAN Ê.

28.01.1998 B.B. TEYFÛRÎ.

**Dîsa hovîtî**

Li ber hovîtîyê zulm û zorê
neheqîyê
hêrsa ricaf ketîye laşê min
kerba destê minda pênûs digrî
peyv wîcdan şeref digrî
dilêm digrî
namûs digrî
dîroka min bi xwîn digrî.

Dîsa qetlam
pêş cavê min
lawêm
geçam
dê û bavêm
ba pîrê min
pêşeroj a min zarok kuştin
xûşk û bira li ser axa welat ê min
xûnêda mewicandin
dîsa kuştin
bê kes bê pişt bê war hîştim
vê qadêda tenha hîştim
ax birîneke xezeb dilêm xistin.

Xemsarîya mirovahîyê
durîtîya cîhanê
bê dengîya pêşengan
derewên oldaran
cudatîya bawermendan
lal bûna edaletê cîhana dagirkeran
ger bûna serokên kurdan
ez kuştim
namûs mir
şeref wîcdan rûmet mir.

Zulm û zora sextekaran
îxanetê,durîtîya xwefiroşan
mirovahîya hov
ez kuştim.........

EVîNDARê JîYANÊ
EFRANDARê EDALETê
bawermendê rojê kuştin
bawemendê tav ê
xwîna sorda mewicandin

*Ehmed mustefa*



## Efrîn

Efrîn ê Evîna dila
Hêvîya min û axîna sala
Ji hezdikim mîna dila
Boyî hêsir li ser dema
Efrîn ê Evîna dila

Efrîn ê Evîna dila
Tûyî gula li baxçê gula
wenda mayî kurdo wendame
Efrîn ê Evîna dila Tûyî gula li baxçê

Bi dilê şewat gazî dikim
Efrîna min biparêzin
Kurdo rabin hev hembêzkin
Axa xwe biparêzin
Efrîna min biparêzin

14.7.2013

............


## Birîna dil

Xençerek tûj xistin dilê min
Û li mirina min digerin
Darên bipelên şîn qitkirin û birrîn
Ava jînê li min kirin jehira reş
Kuştin bihara Xweş rengîn
Bendewarîya rojeke şad dimînim
Û Li heyva spî li asiman dimeyzînim
Û li veşartî ya brûskeke tûj
dimînim
DaTîrêjên wê min hembêz bike
Û agirê wê yê sor vî xakî biqelişîn e
Da ji nûh va jîna min dest pê bibe

6.7.2013

www.arsivakurdi.org

# *Beyar Robarî*



# Dengê canê

Ken kene xanim ken
Hay kene şêrîn ken
Wey kene delal ken
Jiyan bixwe yar ken
Tevde derew û fen
Dem bi mirov diken
Kenê şanê jî ken
Bi çi lêvan wa diken
Çiya û zozan warê men
Çima felek bi mere naken!
*
Havîn bû yar havîn
Dilê min xurtî wer tîn
Raste te hat wek rêwî
Ava te şanê zemzemî
Bû çareya va serî
Û dermanê vî dilî
Ez pê serxoş û mestbûm
Min nizanî ez di evînê werbûm
*
Çav morê û ciwan rû li dorê
Te heye xweş bisk û porê
1
Pêlin bê her lê didomê
Nizane çiye sînor û pasporê
Şêrînê gulî sorê
Evîn jêre bo gorê
Biborîn dilşadê biborîn
Bav û dê, jibo peran di te borîn
Jinkirin û mêrkirin narîn
Nabin bi kotek û zorîn
*
De weye şanê weye
Gotina min jibo te ye
Ew lêvin têr ciwan
Dagitîne bi ava gilyazan
Wek zarokê dergûşê
Daxwaz ez jê binoşê
Tev tewîn û lorîn
Bi tepe tep û hejîn
Tu min hemêzkî
Û min ramûsankî şêrîn
Da lêv li lêvan bigerin
Û şerbet têde biklin
*
Delalê xweş yarê

Naz gupika li darê
Bo te ez nobedarê
Û dijîm kela buharê
Bendewarim delalê
Botan bi çiya û newalê
Dengê şoreşê jê dikalê
Warê dayîk û babê kalê
*
De rîne heval rîn
Wekî şanê tu nabîn
2
Şana min kurda Efrîn
Gelek naz û nazenîn
De bîne delal bîn
Çi xweşe Aqîb û çiyayê Lêlûn
Çavên xanimê dûrbîn
Daxwaz ji nêzîk de ez bibîn
*
De lorî lewendê lorî
Bawerim tu bê qisûrî
Êş û zehmete, zordarî
Bitaybetî zordariya navxweyî
Mala diravan xerabî
Mirov çi nake jibo wan û nabî!
Kordikin dayîk û babê
Û mirov mirêv difroşê
Çi pismam an birabê
Yan pisxalt û kurê xalê
Lala min tevî hest
Serê min bi evînê mest
Dev û lêv sor sêv
Şêrîn dêm û rû weke hêv
Dengê şoxê zengile
Ji kew û bilbil naztire
Min li şanê mezin dile
Zembîlfiroş û Xatûnê, çi ne!
Evîna me jê tune
Em yekin ne dudune

Dibîne yadê tu dibîne
Ez çi teral û dîne
Baweriyê bi jinan tîne
Ne carek ne dudîne
Ev jî kêmkasî û şaşbûne
Zar ez pê mezin bûme!
3
De wê de canê wê de
Ji Efrînê wê de
Şev û rojekê pêde
Ez û te ve bimeşê de
Ba û padem[1] hêmin be
Çivîk li her şon û derê be
Bi dûrkevin em ji xelkê ve
Û bi mêvanên çolê be
Hevalê me cinawirê wê be
Sirûşt û balind û ezmên be
*
Ne weye zerî ne weye
Dil û mejî li ba te ye
Min xweşik hajê heye
Çi anîn serê te ye
De nabe can nabe
Mala olan xerabe
Pêwîste delameta wan jinav me rabe
Û mirov azad û biserê xwe be
Ne koleyê older û melan be
Divê rêberê me kesên zane be
Bawerî bi mafên mirovan hebe
Jin û mêr liba wî wek hevbe
Zanistî divê ji me re Avêsta be
Û stemkarî ji ser milên jinan rabe
Jibo serbest bijî û ya xwebe
Ne kola bab û mêr û biran be
Civak ya jin û mêran be
Divê ev pêrgola me kurdan be
Nabe han hinav nabe
Rewşa me tim wisa be
Em jihev cûda be
Û jiyana me ji keseran be
4
Divê em herdem bi hevra be
Ne jihevdûr û cûda be
Jiyan bi evîna me şad be
Jîn û jiyana me şêrîn derbas be

www.arsivakurdi.org

Firoşe bab firoşe
Qîzê bi peran difroşe
Hamoşe bi Xwedê hamoşe
Bab keçan wek mêşa hinguv bidoşe
Gamoşe babe te gamoşe
Bi wî din ka û qarûşe
Kesê qelangan bixwaze
Xêr û rindiyê qîzan naxwaze
Sexteye û bê namûse
Hove ne mêr û mirove

*

Hogirên hêja û birûmet
Ev hevpeyvîna dinavbera min û babê de pêkhat:
"Wî got:
Xwestina destê keça me
Namûsek mezine jibo me
Lê daxwaz 150[2] hezarin
An 3000 Amrîkî dolarin
Û fatihe xwendine
Zêr û mêvan û şahî gerandine
Wek din her yek ji me
Li mala xwe disekine

*

Min got:
Nizam çi merî û mirovî
Dixwazî keçan bifroşî
Ne çêlin kû tu bidoşî
Nexwarine kû bixwî piştî rojî

5

Nekiryarê jina me
Ez evîndarê dila me
Bersîva min vaye
Jibo te û hemû baba ye
Kesê bixwaze qelengaye
Nîne namûsa xwe ye

*

Wî got:
Ger nedî tu 150 hezarî
Şanê nadim te ticarî
Gotin gotina min e
Û biryar bi dest min e
Keçik çi bibêje vire
Evîn liba min bayê kure!

*

Min got:
Tu zanî seyda tu zanî
Ez dizanim tu xwediyê malî
Em du mirov cûda ne
Gor em ji yek ol û netewîne
Erê birê min erê
Ka tu gazîke dîlberê
Da zû were vê derê
Da zanibe em gihîştin ku derê"
Şan hat gelek zû
Min jê pirsî û got:
Hev çiye xanim çiye
Bavê te bê şerm û fediye
Te bihîst xwestek çiye
Ez bawerim ev dawî

*

Wê got:
Bihêna xwe fereke
Min nabê ti qelenge

6

Mexeyde delal mexeyde
Xalî li mil û peran be
Û mirovê wan daxwazke
Û keça xwe bazarke
Min nabê milk û mal
Derdê min evîne lo delal
Ev çi hal û rewşe
Bab jibo peran dike cenge

*

Min got:
Gelek silav yar li te
Ez li gel gotina te
Pir riswaye babê te
Derdê wî xwarin û pere!
Hêjaye evîna te
Te got çi, min bi ya te

*

Wê got:
Ez bigorî û heyran
Barê me zehmet û giran
Jibo xatirê van çavan
Guh medê ew nezan
Ey şêrîno dilovan
Ez te nadim
bi cîhan
Min got:
Hay tune yarê tune
Dadmendî ticar tune
Hin li jêr û hin li bine
Ev rewşa gelê min e
Min dile dostê dile
Gotina min ji qinyata dile
Tu li ba Beyêr
Şêrîntir yar û jine

7

Agirî xan agirî
Dilê min xurtî jiber te didagirî
Tu çûka dilşa û firî
Dêm şêrîn lêv şekirî
Mûma te vêxistî dadimirî
Şevê ronî jê bir û dizî
Pora min sipî bû bo hêrî
Û deriyê malê morbû zengirî
Bixwûne canê bixwûn
Ristên seydayê Cîgerxwûn
Destana Zembîlfiroş û Xatûn
Jibo evîndaran hêvî û mûm

*

De nîne lewendê nîne
Heşê dayîka te nîne
Derdê xwe xwarin û pale çinîne
Wê her koleya mêr bimîne
Bese delalê bese
Babê te mezin terese
Jê kême dûv û merese
Ev rastiya wî ye, ne
helweste
Rihana tayî zirav
Tewa bû çîrok lê hinav
Efrîn herêmek zor ciwan
Te xwe firot pir erzan
Min tune yarê tune
Bawerî bi qismetê tune
Min digot belkî te jî derd evîne
Min nizanî xwasteka te, bes mêrekî bîne!

*

Wê got:
Ey çima çima çima
Te ez hîştim jibo xeman

8

Dinav bêheş û kêm aqilan
Û ev mirovên wekî hovan

www.arsivakurdi.org

Wey lehengê rebenê
Delav li min bû tengê
Kesî negot min te çi derdê!
Were ji min re lo xeber de
Çima dengê te hat derenge
Piştî ez hatim kirîn û firotin
Bi zêt û zêtûn û kerenge
Wek bizinan bê denge
*
Çima delal te wekir
Ez di dojehê werkir
Dilê nerindan bi min şakir
Jiyana min reş û qutrankir
Ez heyrana te dilovanî
Tilî û ew ristên te hûnandî
Dilê min hîro şikestî
Ranabe ew rawestî
Ez dinalim ji hestî
Serboriya min tu kanî bi helbestkî
Lo delalo dil biro
Dilê min li ba te ye, lo kuro
Ji cîgerê te ez kiro
Jiyan bê te delal mirino
*
Wey nayê yaro nayê
Bê te arama min nayê
Xew nabîne çavayê
Bihêna min tengbûyî ji jiyanê
Ma ez çi kanim bikim
Ez keçim nexurtim
Bê per û baskim
Ez tenê kanim gazkim
9
An ji nav vê civakê barkim
Yan laşeyê qaz û arkim
Civaka me ya mêran e
Jin dijîn li bin lingan e
Piştî Îslam hat nav kurdan
Mafê wan hat du pûlan
Jin hatin asoya koleyan
Tên bikaranîn, jibo kar û zaro û razan
Ka ew wekheviya civaka Kurd
Ya me hebû dema
Zaredeştê merd
Hîro karê jinê bes razîke mêr

Û amede nivîn û xarin û nên!
*
Min got:
Lê dîlberê lê şanê
Tev hemû xeman, ji dilê min tu narê
Tu têde hatî çandin, gulbuharê
Şînhatî wek nuçê darê
Dema dara me bilind bû
Nerindan anîn xarê
Çavên wan derên
Kesên bûnî sedem lê nazdarê
Kû nehîştin em bihevdû şabin evîndarê

-----------------------------------------

[1]- **Padem**: Ev peyva ji du beşan pêktê: paş û dem. Min dît kû paşdem hinekî dirêje jiber wê min kinkir jibo bihêsanî were bilêvkirin û kir padem. wateya vê peyvê bi îngilîzî (the weather) û bi erebî jî (الطقس). Peyva kû çapemeniya kurdî û bi taybetî wênguhêz (tv.) bikartînin şaşe. Jiber kû peyva **hawa** erebî ye û wateya wê bi kurdî ba ye. Û peyva ba ji pademê cûda ye û biher zimanî jî wisa ye .

[2]- Sedûpêncî hezar kaxezî (wereq) Sûrî .

## *Muhemed şerîf Birhik*

## Dûmana bê dawî

Ez ne ku korim dibînim
Nikarim bêjim bi brînim
Derdan li ser hev dicivînim
Armancê bi bingihê pêk bênim

Zanîn û zemînê ne vemrînin
Bê hêk û hêlîn kewa difrînim
Pîrbûne ramanê ji xwe hlînin
Şoreşgeri yê hûn bi xwre na bînin
Dara Azadî yê jê re hûn dihejênin
Kurmik û kêzika jê hlînin
Da hûn Baz û şahînan jê bifrînin

Bê nerîn û raman jê nabin
Şevê tarî bi giranin
Yê êor ji nav xwe veqetênin
Omîda pakrawana pêk bênin

ÇÎROK

*Lewend Dalînî*



# GORISTANA WELAT!

Sibehê meçe çiyê êzinga! va dengê qupe qupa Tifeng û Temetîka tê! û derve jî pirr sare îşev! kû ez ne şaşbim ev şev şeva berfê ye! Pîra Menco berî kû razê ji Birhê re got!.

Bi sehara serê sibehê re şiyarbû û berî kû Pîra Menco şîyarbê û nîska sibehê jêre pêşkêş bikê û hinek Mewîj û Benîyê Hejîra berdê binê Tûrê wî weke her sibeh! Rabû xwe amade kir, cilên hirî û germ li xwe kir, û berê xwe da çiyê kû barek êzing bînê û bibê bajêr bifroşê, qedandinê rojê bi mafê wan bikire û ji Pîra Menco re bîne malê!.

Birhê di paîza dawî ji temenê xwe deye, lê hîna bi dar û bere;. Werîs û Tûrik li milê wî ê çepê ne û di destê rastê de jî Bivirê wîye, kû bi salan herdiwan qeysa xwe di cane wî de çêkirine!.

Ji gund dûr di keve û ber bi çiyayê bav û kalên xwe de dice . Berf hûr hûr di barî û xwe li pozê Birhê dida… Geh li rast û geh jî li çep!.

Gavên xwe sivik kirin û di ber re jî lawikî xortanî: (Bavê Fexrîya swarê Gênco torinê malê dinya ewreee… Lê nabê Sayî … Hawar delal; Lê midî li Bave Fexrîya rabû bû Tabûra Sêrtê sê A'layî !) bi kêf di got û di lezand; berî berf xakê bigrê..

Kete nava çiyê û xaç û rêk li xwe fitilandin û ji xwere got : Îro ezê rîya xwe kinbikim û ezê herim wî rexê jorî! ji mêj ve min êzing ji wê deverê nanîne! çend darê hikbûyî li wêdê hene!.

Çaroxa lingê wî pelê ji dara weşandî di perçiqandin û li rûbarî keleman berxwedan dikir, da bi karibe lingên xwedîyê xwe ji brîndarî yê bi parêzê! Û berî lingê xwe rake û deynê, çavên wî li dewsê di nêrî û şop kontrl dikir! Ji ber ku berfê hêdî hêdî şop winda dikiri û bi tirs bû kû lingê wî şaş ê korteke yan jî li kelemekî bi terpilêê….Ûji nişka ve, çavên wî li dilopên xwînê diketin!; di cihê xwe de rawestîya û bi tirs li hawîr dora xwe nêrî û hêdî hêdî nêzîkî dilopên xwînê kû li ser pelên dara ziwabû bû bûn dihat!. Rahişte pelekî didwa, û li pey şopa dilopên xwînê çû!? dilopên xwînê hin bi hin zêdetir dibûn!. Şîneke kûr kete dilê wî de û bi sistî gavên xwe bi pêş ve didan . Di wê gomanê de nalînek hate guhê wî! gelo ev nalîna kêye! ji xwere dibêje!? Ber bi pêjnê de çû; hêrzê mêranîyê di damarên enya wîde cih girtin û bi lez rîya xew di nêv şax û çuqlîyên dara re vedikir û li pey xwînê diçû!.......

Li ber lateke mezin Birhê laşek di nav golek wxîn de dît!.

Bejna bi Şal û Şap, Rext û Fîşeka girêdayî , ji xwînê sor bûbû. Bi lez xwe gihande ber serê wî destê xwe di ser çav û enya wî re bir kû xwînê ser wan bidê alî! Xwîn hişk bûbû!. Tû kîyî û navê te çiye Kalo jê pirsî?. Bi zarekî sist û cemidî Eeezim WEELAT.... Kurê.. WELAT! ? û bi van herdû gotinan re zarê wî nema livîya! û ew giyanê pakrewan diyarî Welatê xwe kir!.

Birhê çavên wî girtin û bi melûlî li berqefa latê jêre gorek kola û ew têde bi cih kir!.

Bivir, Tûrik û Werîs avêtin ser herdû milên xwe û bi valayî vegerîya ber bi gund ve . Bi dil şikestî digot:-

Wey Axaoo! Wey Axaoo!..... Yek jê Cemîlê Seydaye wê salê Bêlok mihû dikirin çawîş davêtin avê oo!.

Ezê bi Simê Miqrê bi kurra Bangokê bi xopana Tinatê diketim ji êvara xwdê da bi Hejîra!..Bejna Welatê delal bejna Şalan û Şapika Rexta û zincîra!....

www.arsivakurd.org

**Sernivîser**
Qado Şêrîn
**Rêvebirê Nivîsînê**
Arşek Paravî
**Desteya birêvebir**
Abdilbaqî Huseynî
Ezîz Xemcivîn
Lawîn Şêxo
Pîr Rustem
Silêman Azer
**Derhener**
Xorşîd Şûzî
Ji bo hinartina berhemên kurdî:
kurdi.penusanu@gmail.com

